

welat

Sal:2 Hejmar:61 18-24 Nisan 1993 5000TL (KDVD)

Rojnameya Hefteyi

Esma
Uveyş
Öcalan
wefat kir

Rüpel 16



Serokê YNK'ê Celal Telabanî, dema nû ji Welat re nirxand:

'Herkes aştiyê dixwaze'


● Herkes aştı dixwaze. Herkes bawer dike ku Kurd heqê xwe bistin. ● Prosesa çareyên siyasi û demokratik bi pêş ve diçe, ev proses êdî nema vedi. ● Ez ne navber im. Lê ez dostê PKK'ê me. ● Ger 'ateşkes' dirêj bibe, dewlet jî wê şer bide sekinandin. Bi resmî nabêje, di fiiliyatê de dike. ● Tişa ku PKK'ê kiriye şoreseke siyasi ye. Zimanê şo-

reşen politik û şoreşen çekdar ji hev cuda ne. PKK gerek e vî tiştî bike. ● Piştî ku PKK şerrawestin dirêj kir, dewlet şer bike wê şer ji Tirkan re gelekî xerab be. ● Şerrawestin, insiyatifa Apo bi xwe ye. Ger Apo nekiriba tu kesî nikaribû bikira. ● Berê digotin "Mesela Kurdan tune." İro herkes dibêje "Heye" û lazim e riya demokratik vebibe.

Rüpel 8-9



Serokê YNK'ê Celal Telabanî di şeva HEP'ê de.



'PÊWISTÎ BI XEBATA PROFESYONEL HEYE'

Pêwist e xebatê zanyari yên muzikî pêşve herin. Muzika me, divê di meydanê navnetaleyî de cihê xwe bigire. Divê operaya Kurdî jî hebe. Em bi hewcayê her cure miqam û awaz in, stranê gelêrî, mérâni, şoşegerî û evînî, li ba me divê hebin.

Bi hunermend Ozan Şemdin re hevpeyvîn

Rüpel 11



ŞAÎRÊ MEZIN OSMAN SEBRÎ JI BO WELAT HELBESTEK NIVİSİ

Divê em xwe pêk bînin ji bo felata xwe Biji serbilind wek çiyayê welatê xwe Riya felatê pêş me dike, ew ravekar e Li pêşberî gel û dîrokê berpirsiyar e Biji welatê min ji bona te gorî can Sond dixwim ku bibim pandî ji bo Kurdistan Di rûpela 13'an de bixwînin



Dr. Alî Kılıç

Rüpel 12

Em mecbûrî hev in

Îro pirr kêfxweş im. Lewre Serokê PKK'ê yê hêja Abdülâh Öcalan û yê PSK'ê birêz Kemal Burkay dest dane hév. Berî vê demê "Yekbûn" jî ava bûbû. Lé ev yekbûyin ne wek 1980'yan e. Şekl û şemala vê cihê ye.

Îro hem li gerdûnê (dîn-yayê) û hem jî li Rojhilata Navîn merc (şert) gelek hatine guhertin. Li Kurdistanê jî, rewş pirr guheriye. Ji niha pê ve, mirovên welatperwer (welatparêz) nikarin bê berpirsiyari bilivin. Lewre xwîna şehîdîn me li erdê ye û li berlingê me ye. Em nikarin pê li xwîna şehîdîn bikin.

Xwîna şehîdîn me, gelê me yê ku xwe ji xwe berdayî û jibîrkirî, anî ser xwe. Kir ku gel li xwe xwedî derkeve. Em êdi nikarin ji bo dijmin û biyaniyan comerd bibin, destvekiyî bibin.

Vatiniya (peywira) me ew e ku, em ji bûyeran dersan bigirin. Ji bo xelkê xerîb êdî bes e. Rostemê Zal ji Persan. Ebû Muslim ji bo tola Îmam Hüseyn zafer standiye û morê disa daye destê dijminê Kurdan, dijminê mirovan. Ew jî, ji aliye yê ku anîye ser text ve, hatiye cîfîcîkirin û avetiye çemê Tigrîsê. Selhedînê Eyûbi îslâmî xelas kiriye. Lé gelê xwe ji bir kiriye. Li dû wan jî xayîntî dest pê kiriye. Yek ji wan ji bo nimûne Sêx

İdrîsê Bîlîsi.

Ev jî tiştekî enteresan e (balkêş e), mamosteyên Jon Tirkân jî Kurd in. Wek Dr. Abdullah Cewdet û Ishak Si-kutî.

Çima em Kurd xwe bi xwe nabin? Çima em bi dû xelkê dikevin? Em jî gelek in, nete-weyek in, bi xwe seri ne.

Îro partiyên me jî hene. Divê hemû Kurd bikevin nav partiyên xwe. Mirovê ku li hespê xelkê siwar dibe zû dikêve. Divê Kurd xwe nexapînin. ANAP, DYP, RP, DSP, SHP û yên din, hemû partiyên Tirkan in. Ev partî ne yên Kurdan in. Ew hemû partiyên Tirkan, dijminen Kurd in. Ne bi tenê MCP, Mesut Yilmaz, Bülent Ecevit, Alparslan Türkeş, Necmeddin Erbakan, Süleyman Demirel, Erdal İnönü û yên din gişt dijminen me ne.

Me heta niha ji Tirkan dijminî dît. Kurd ji bo Tirkan mirin, Tirkan jî Kurdan inkar kir. Îro jî fedî nakin, li berçavê me virran dikan. Radibin dibêjin Newroz cejna Tirkan e. Divê mirov ji wan qesmeran bipirse. Ma heta îro çima we Newrozê nas nedîkir? Newroz cejna Kurdan, Persan, Efganiyan, Pakistaniyan û Belüciyan e.

Ji salnameya Avesta pêş ve Newroz heye û tê pîrozkiyîn. Zafera Kawa tê de heye.

Hinek dîrok dibêjin 20'ê Tebaxê, hinek jî dibêjin 30'ê Tebaxê. Tirk dixwazin dîroka me ji xwe re bikin mal û rojê dirokî.

Ji bo doza me, politika û siyaset gelek pêwist e. Lé ne di nav partiyên dewleta dagirker dû mêtîngehkar de. Edî me hev û din pirr nas kiriye. Em dizanin ew hemû parti li dijî Kurdan in. Kirin û şanen dewleta Tirk li ber çavan e. Helwesta partiyên wan jî.

Îro nêzîki 108 mebûsî ku bi eslê xwe Kurd in, di meclîsa Tirkan de hene. Divê mirov ji wan bipirse, we heta niha ci ji gelê xwe re kiriye? Tew bi ser de hemû qanûnên ku li dijî hebûn û mafêñ Kurdan derdikevin jî, ji aliye wan ve tê pejirandin.

Di bin mercen pirr giran de PKK û welatperweren din doza Kurdan pêşve birin. Bila li hemberî PKK'ê kesek xwe li jêrê nebîne. Îro PKK ye, sibê navekî dinê ye. Endamên PKK'ê xwişk û bî-rayen me ne, canê me ne. Kijan Kurd dibe bila bibe, ji PKK'ê hez dike an ji nahe tişte ku divê em bibînin ev e. PKK îro şerê azadiyê ji ku derê anî kijan pîleyê (merhalayê) ye. Apoyê hêja îro li Rojhilata Navîn dozê bi şerê berxwedanê anîye dereke gelek nazik. Li bakurê Kurdistanê bi têkçûna Serhildana

Dêrsimê rewşa me gelek xerab bû. Di salê 50'yan de mirovên me hatin rizandin. Di salen 60'î de Dr. Şivan û hevalen wî dest bi vê pîrsê kirin. Di demeke kin de, ew jî hatin kuştin. Lé ci heyf ku, ew bi destê Kurdan hatin kuştin û cewtiyeke pirr xerab bû.

Ev sûc ne bi tenê yê Mele Mistefa Berzanî ye. Ên Moskova ye, Waşîngtonê ye, Bexda, Tehran, Enquerê ye. Mam Celal, lîstikên neyaran baş tespît kiriye, siyaset û takîfîn Rojhilata Navîn ji hev hilçenandiye û vejetandide.

Di van rojan de, wê tişten hîn xweşîr çebîbin. Îro Apo, Burkay, sibê jî wê yên din hemû dest û milan bidine hev.

Em Kurd bi mecbûrî, eme hev û din bigirin. Wekî din care tu nîn e. Camêriya me ya ku heta îro ji bo xelkê bû, ji niha pê ve eme ji bo xwe xerc bikin.

Dewleta Tirk a nîjadperest fêm kir ku, pirsgirêka Kurdi, pirsgirêkeke navneteweyî ye. Pers jî û Ereb jî fêm kirine. Lé heke ku Kurd ji vê rewşa xwe fêm nekin, pirr şerm e. Îro eger Kurdeks negotibe şehîdîn ARGK'ê şehîdîn me ne, ew Kurdeksî xayîn e. An jî Kurdeksî bêhiş e. Bila tu caran neyê jibîrkirin ku, bi van şehîdîn em gihiyane van rojan.

Vatiniya me hemûyan ji hev hezkirin e, kêmeşî û quşûren hev tamîrkirin e.

Temeli

FERHENGOK

(ZAZAKI)

Astare/i: Stêrk (Yıldız)

Akerde: Vekiri (açık)

Alişki: Dêm (yanak)

Amordîş: Hilbijartın (saymak)

Bo: Bêhn (koku)

Feriz: Pêwist (farz)

Hemlik: Xurt (semiz)

Henzi: Şîn (yas)

Hargûs: Kîvrosk (tavşan)

Per: Rûpel (sayfa)

Rayan: rîwî (yolcu)

Enawa: Wiha (böyle)

Ena: Ev (bu)

Piya: Bi hev re (beraber)

Qewl: Gotin (söz)

Qil: Gir (tepe)

Qorik: Piş (sirt)

Qişayış: Girin (ağlamak)

Qeçek: Zarok (çoçuk)

Takêş: Debeng (salak)

Tipiya: Paş (geri)

Toj: Tûj (sivri)

Vara: Baran (yağmur)

Veraj: Pal (yokuş)

Veri: Berx (kuzu)

Verin: Berahî (enli)

Veyvi: Bük (gelin)

Vêr: Neqeb (geçit)

Vêsan: Birçî (aç)

Weş: Rind (güzel)

Zanayox: Zanyar (bilgili)

Zerî: Dil (gönlü)

Zerzewat: Sebze

Zerrhera: Sabir (tahamül)

Zên: Ger (eger)

Zigar: Kevir (taş)

Zerwes: Bextewar (mutlu)

Xortê delal, xwişkê hêja, dayîkê Kurd

Ji xwe pirs bike ji bo ci radyo û televizyonen cihanê û leşkerên Tirk bi me re bi zimanê me yê xweş û delal xeber nadîn. Û bi me re bi zimanê xwe yê ku bi me tahl û nexweş e. xeber didin. Zordestan di weletê me de dibistan vekirine, lê zarokê me yên diçin dibistanan, ne bi zimanê xwe yê xweş, bi zimanê dewleta Tirk a faşîst hînî xwendin û nîvîsanînî dibin.

Zarokê me, gava diherin dibistanê, mamoste (mualim) ji wan re dibêje, bibêjin "Türküm Doğruym" lê nabêjin bibêjin "Kurdîm Dürüstüm" ji ber wê ez dibêjim ku, em li zarokê xwe xwedî dernekevin, zarokê me (en ku dibistanê dixwînî) wê bibêjin em ji Tirk in.

Gerek e em zarokê xwe yên delal hînî ferhenga Kurdi û xwendina rojnameya "Welat" bikin û bi xwendina Welat jî nîvîsandina xwe bi pêş bixin.

Hinek hene ku, kûçikê me ne, an li ber pezê (heyvan) xelkê ne, an jî cerdevan in ku, leqayı me dibin bi me re bi Tirkî xeber didin. Û dibe bilde bilda wan, kes ji wan tiştekî ji fêm nake, ji ber ku bi zimanê Tirkî jî baş nizanin. Xwedî kiriye bi Tirkî jî baş nizanin, nexweş û dinya xira kiribana.

Li ser derketina Welat çend gotinê min hene.

Ez dixwazim ku we ji we re pêşkêş bikim.

Heftiya ku wê rojnameya Welat derê, di rojnameya "Yeni Ülke" de nîvîsandibûn ku wê heftiya pêsiye me rojnameya Welat derê û temamê nîvî bi Kurdi ne. Ez ji bi dilgermî li benda rojnameya Welat mam, da ku derê ez ji bixwînim.

Roja lehdê (Pazar-Yekşem), li Midyadê esnafan kepengên xwe girtibûn, ji ber vê yekê êz ji çum Estilê û li bayiyekî min rojnameya Welat dit û kirî. Ez

hatim malê, min xwend. Lé min tu tişte ji fêm nekin, dawî min rojnameya xwe xist berîka xwe û ez çüm cem hevalen xwe. Min mizgîna derketina rojnameya Welat da hevalen xwe, serê ewil ewan jî, jê fêm nekin. Û gotin ku: "Tu jê fêm diki?" Min jî got: "Na wele ez ji jê fêm nakim. Lé ez mecbûr im xwe hînî zimanê xwe yê zikmâkî bikim." Û bi havalen xwe re min hêdi hêdi xwe hînî xwendin û nîvîsandina zimanê Kurdi kir.

Ji roja ku rojnameya Welat derketiye heta niha, tenê ez mehekî ji Welat dûr ketim, ew jî ez çübûm şixul (kar), cihê karê me ji bajêr dûr bû û rojnameya Welat ji li wir tune bû. Min ji dukana bakkal re tembih kir, da ku gava here bajêr ji min re Welat bistîne. Wî ji tenê carek ji min re hejmarek anî û hew. Min dipîrsî: "Tu çima nayî", sond dixwar digot: "Li

bajêr qet tune ne." Ez ci serê we bişenîm, dawî ez hatim mala xwe û dîsa dest bi xwendîna rojnameya Welat kir.

Piştî demekê bayiyen rojnameyan disa rojname nedifirotin. Me jê dipîrsî: "Hün çima Welat nafiroşin." Bayî jî digot: "Ji bo ku cerdevan û polis me tehdît dikan ez rojnameyan nafiroşim." Dawî ez bûm aboneye rojnameya Welat û her hefti rojname ji min re tê, ez ji bi kêt dixwînim.

Ez soz didim ku, serê min ji biki ez rojnameya Welat bixwînim û ez bi hevalen xwe ji bidim xwendin. Ez soz didim ku salek ji, ji emrê min bîmîne ezê rahêjim çeka xwe û ez bi hemberî dijminen xwe yê faşîst û bi caşikên xwefiroş re, ta dawaye şer bikim.

Silav li we, rojnameya Welat ez xebata we bi dil û can piroz dikim.

Suddayî / Midyat

Evîndar im

Welatê min pîr hêja ye
Cihê bav û kala ye
Bila canê min qurban bibe
Kurdistana min hêja ye

Va serîn e li benda te me
Va esmer e li hêviya te me
Tim û tim li bîra min i
Ez nexweşê bejna te me

Îro zeman li me xera bû
Bihara me jî winda bû
Gelekî min tu dixwestî
Ava mezin li me rabû

Kulê min zaf in bin erd e
Ez ketime pîr derd e
Tu kulê bide ji bîrkirin
Evîna min, minê berde

Hezar sal e ez birîndar im
Evîndarê axa xwe me
Tu ji min re neke eyb e
Evîndar im, evîndar im

Rêzan / Mêrdin



Zarokên NÇM'ê dixwazin besdarî sahiya 23'yê Nisanê bibin

Navenda Nûçeyan- Navenda Çanda Mezopotamya ji bo ku koma wan a zarokan ji besdarî sahiyên 23'yê Nisanê bibe. mureceeti Wezareta Çandê ya dewleta Tirkîyê kir. Navend. dixwaze bi navê zarokên Kurd. besdarî sahiyê bibe û wan temsil bike.

Navenda Çanda Mezopotamya ji nezikî du salan e ku. li bajarê Stenbolê ava bûye û li ser çanda Kurdî xebatê dike. Di bin siya navendê de

komên muzikê. govendê. şanoyê. wenê. sinema û xebatê din ên çandî tê kirin.

Koma Zarokan a Gulê Mezrabiton heta niha qase-tek muzikê bi navê "Lezkin" derxistiye. Navend ji bo ku di sahiya 23'yê Nisanê de li ser navê zarokên Kurd besdarî bibe. serî li wazereta Çandê da.

Berpirsiyarê Gulê Mezrabiton Yetkin Yetkîner sebebê vê serîlêdanê wiha diyar kir.

"Mebesta me ew e ku, di vê sahiyê de em zarokên Kurdan temsil bikin. Şahî, bi navê sahiya zarokên dinyayê her salî dar dikeve. Madem ku sahiya zarokan e, em dixwazin zarokên Kurd bi zimanê xwe yê zikmakî silava aştî, wekhevi û biratiyê li gelê dinyayê bike."

Serîlêdan di 9.4.1993 yan de hate kirin. Heta niha tu bersivek ji Wazereta Çandê ya Tirkîyê nehatiye dayîn.

Dewlet şerê qirêj didomîne

Navenda Nûçeyan- Pişti cejna Newrozê dewlet tevi biraya şerrawestinê ku ji aliyê PKK'ê ve hat îlankirin. şerê xwe yê qirêj li hemberî gelê Kurd didomîne û dest bi cerdi-ser gundan dike. Günden navçeyen Batmanê Hezo û Sasonê. **Herendê. Heriwe.**

Herdayê. Terêş. Tanzê. Permisa. Şexikan. Helis. gundê **Tumoq** û gêndên navçeya Pîranê ya Diyarbekir. **Kelkom. Alizilfi û Zixir.** gundê navçeya Pasûrê ya Diyarbekir **Dûderya û Araşka.** ji aliyê hêzên dewletên ve. bi awayekî hovane hatin hilweşandin. Gundî ji hatin kocberkirin.

Li çiyayê Sasonê Kevirêbûkê. Çiyayê Biçük. Bêlavê û li Helisê operasyon têne pê. Li gor agahiyan. di van operasyonan de. di lihevxitinekê de 18 leşker hatine birîndarkirin. Kuştî û birîndarê gerîla nîn in.

Gundê Tumoq ji. ji aliyê hêzên dewletê ve bi du rojan hat çeperkirin. Pişti du rojan dev ji çeperek berdane. Çeper bi hinceta ku gundî alikariya gerilayen ARGK'ê û ew bi nan û

av kirine hatiye kirin.

Di 8'ê Nîsana 1993 yan de. hêzên dewleta Tirk cerdekê birin ser gundê Kelkomê ya navçeya Pîranê. 150 mal hilweşandin. Li gund 1500 kes dijiya. Gundî koç Amedê bûn. Ze-rara gund 10 milyar tê hesibandin.

Heyetek li ser bûyerê di 10'ê Nîsana 1993 de cûn Kelkomê û bûyerê li cih rapor kirin. Heyet ji Şaxê Komeleya Mafêni Mirovan a Amedê û hin rëexistinê demokratik pêk hat. Serokê Komeleya Mafêni Mirovan a Şaxê Amedê Sedat Aslantaş. bûyerê bi gotinê "Ev terora dewletê ye" nirxand û protesto kir.

Gundê Zixir ji. tê valakirin. ji ber pest û pêkutiya dewletê. Hêzên dewletê ji bo valakirina gund heftiyek muhlet dane gund. Rewşa gundiyan Alizilfi ji mîna Zixir ye. Ew ji. ji bo terkirina gund heftiyek muhlet jê wan re hatiye dayîn. Di cerde de leşker pênc xanî dişewitînin.

Li ser gef û gurrên hêzên dewletê. gundiyan gundê navçeya Pasûrê ya Amedê. Duder-

yâ û Araşka gundên xwe şemirandin (terikandin). Gundî koç Amed. Bismil. Stenbol û Mîrsinê bûne. Gund. ji binî ve ji ber tahde û pêkutiya leşkerên dewletê ve hatiye yalakirin.

Li navçeya Norsînê ya Bîlisê. li gundê **Çaliyê** hêzên dewletê gundiye kust. Bûyer li çolê li ber pez diqewime. Bi kuştî Behçet Ekîncî re M. Bakî Alpacan ji hebûye. Li gor vegotinê M. Bakî Alpacan, sê kesê ku kincên leşkerî li wan e ji helikopterek Kobra peya dibin û bêpîrsin gulleyan li wan direşinin. Di vê navê de Behçet Ekîncî tê kuştin. Kuştî ji aliyê Qeymekamê Norsînê ve mîna "terorist" hat binavkirin.

Di 10'ê Nîsana 1993 yan de hêzên leşkerî li navçeya Pallo ya Mazrayê (Elezîzê) pira li ser çemê Feradê hilweşandin. Riya 20 gundan li ser vê pirê ye. Pir. ji hêla leşkerên ku li herêma operasyon dikin. tê pe-laştin. Bi hilweşandina pirê re. reya 20 gundan tê birîn. Her wiha di nav van gundan de tê gotin ku wê pirsgirêkên tenduristî (sihetî) û qatî serî hilde.

HAWAR

Dilbixwîn

Koma Berxwedan, di navbera kevn û nû de

W eke ku ji hêla giştî ve tê zanîn, qaseten stran û dilokan piyaseyê dagirtine. Nizanim ji bo ci, berê her kes komunist bû, "şoreşger" bû, internasionalist bû, çep bû.... Xwe bi stûyê biyaniyan bilind dikir, bîborîn serê xwe bilind dikir.... Belê, berê her kes bi tixüb be jî, hîmdarê nüjeniyê bû.... Dîroka jîdayîkbûna Le-nîn, Marx, Engles û hwd. baş dizanibûn, heyâ bi navê dê û bavêwan jî dizanibûn.

Bêrê, bi berê re çû. Niha em di demeke nû de ne, werin em li ser tiştîn nû biaxfîn.

Her kes bûye hozan, her kes bûye dengbêj, her kes bûye muzikvan û her kes bûye xwedan grûpê muzikî. Bawer bikin em hemûyan jî têxine mîzînê emê bibînîn ku, nikarin bibin giranî di pêşxistina çand û hunera Kurdî de, eger armanc pêşxistina hunerê be.

Di tevgera hunerî ya hemdem de, weke her kes dizane Koma Berxwedan heye. Rêveçûna Koma Berxwedan a hunerî xwe dirêjî 10-12 salan dike. Çendî ku gava yekemîn li deriveyî welêt avêtibe jî (Almanya) dîsa em dikarin bibêjin gaveke dîrokî avêt, xurt avêt. Huner-mendîn ku ew avakirine baş rewş nîr-xandine, baş kevirê xwe bi cih kirine. Mirov bi pîrozî li avakirina wê dinere.

Rastiyek heye, divê em bizanibin, jarbûn û zeif-bûna Komeke weke Berxwedan meydana leyîstina bi hunerê dorfî-reh dike. Ev jî, li holê di dema niha de diyar e, cihê dax mixabinê ye!

tir in. Mirov nikare du caran li qaseteke wan guhdarî bike. Eger bi vî rengî rewş here, di nava van pêşketinan de Koma Berxwedan nikare cihê xwe weke berê bi xurtî bigire..."

Gelo, hevalên Koma Berxwedan ev pirs ji xwe kiribin: Ci-ma gelo, rewşa me di navbera kevn û nû de ci ye? Ji bo ci gel me di dema kevin de baştir dibîne? Çarçova hunera me teng e, yan em ji bo pêşketinê ne amade ne, di warê hunerî de? Lî mijar tune ne, em li ser diwarê hunera xwe ava bîkin? Pirs gelek in, bersivîn wan pîrsan jî fireh in.

Rastiyek heye, divê em bizanibin, jarbûn û zeifbûna Komeke weke Berxwedan meydana leyîstina bi hunerê dorfî-reh dike. Ev jî, li holê di dema niha de diyar e, cihê dax mixabinê ye!

Bi rastî ez bi gelek hozanên K. Berxwedan re rûniştîme, em li ser vê mijarê axivîne. Bi vî rengî K. Berxwedan nikare weke berê di nava dilê gelê Kurd de cihê xwe bigire. Bi vê yekê ez maf didim gel, çîma?

Ji bo ku em bersiva vê pîrsê bidin, divê em delameta komike hunerî ku bi hêza şoreşke neteweyî were afirandin bizanibin: Ci ne? Di dema şoreşê de, bersivdayîna şoreşê bi hunerê di warê karvaniyê de ye. Yanî dibe xwediyê şehîdan, dibe dengê şehîdan, dibe dengê tifingan, dibe çiya, zozan, zindan, gerîla, gundî, cotkar.... Bi kurtî ci bi şoreşê gerek be, dibe ew tişt. Dema ku ev grûp bersiva şoreşê bi hunera xwe nede, hingê mafê gel heye rexneyan lê bigire.

Weke di hemû warêni jiyanê de, di warê hunerî de jî divê K. Berxwedan 12 salen derbasbûyi bîne pêşya çavên xwe. Ew salen xweş û şîrin, ew stranen ji dil, stranen ku kevir li ser çiyan dikelandin, stranen ku gotin û müzikê, xwe li hev dipêçandin, weke ku xwezayî bin. Dilê gelê me van dîlok û klaman dixwaze. Ji kerema xwe re serê xwe deyin ser singa gel û bi germaya xwîna di dilê wan de, bihesin.

Li ser dil jî, bistêrin, ew jî wezîfeyek e, jiyan bê dil nabe. Evin be jî, wezîfe ye, şoreş be jî wezîfe ye. Lî hema bila di bîra we de be ku, gel li benda dengê we yê zîz e. Weke berê dîsa me bi xwe re biggerin. Ne tenê em, bila her kes bi karwana me re berê xwe bide berbanga serxwebûnê.

Elçîbey hêviya xwe ji Tirkîyê birrî

Serê di navbera Azerî û Ermeniyan de ciqas diçe dijwartir dibe. Tevî hewldana Rûsyâ ya ji bo lihevanîna terefan, heta niha tu encam nehatiye standin. Li gor nûçeyen ajansên biyanî, hêzên Ermenî di vî serî de gelek gund û bajarên biçûk xistine destê xwe. Li hember Ermenîstanê, Tirkîye bi devkî aligiriya Azerbeycanê dike.

Nûçeyen Derve- Serê ku berî du hefte di navbera Azerbeycan û Ermenîstanê de ji nû ve dest pê kir, roj bi roj berê xwe fireh dike û bala dewletên cînar û yên Ewrûpi jî dikîşne ser xwe. Tirkîye, tevî ku herdem aligiriya xwe ji bo Azerbeycanê tîne ziman, banga Azerbeycanê ya alikariyê ser guhê xwe re avêt û ev jî bû sebebekî girîng ku, Serokê Komara Azerbeycanê Elçîbey, ji Tirkîye bixeyîde û xwe nêzîkî Iranê bike.

Roja 13'ê Nîsanê şeva Çarşemê di programa roja 32. de Serokê Komara Azerbeycanê **Ebulfez Elçîbey**, li ser tewra Tirkîye wiha peyivî: "Em êdî ji Tirkîye tu tişt naxwazin, me jê çar helikopter xwest ji bo ku, zarok û jinê birîndar û

şerpeze xelas bibin, bes ev daxwaza me nehate cih. Vêca, pişti vê yekê emê ci ji Tirkîye bixwazin. Tirkîye ku herdem bi devkî wek aligiri me xwe nîşan dide, di meseleyek wiha heyatî de jî, çar helikopter neşandin alikariya me."

Di van gotinên Elçîbey ên xemgîn de baş diyar diye ku, Elçîbey hêviya xwe ji Tirkîye birriye û di bin van gotinên gazonî de, rexneyen dijwar veşartî ne.

Li aliye din Iran, xwe roj bi roj nêzîkî Azerbeycanê dike. Her çiqas Iran jî, heta niha tu alikariyeke berbiçav nedabe Azerbeycanê, dîsa jî di axaftinên serokên Iranê de xuya dike ku. Iran dixwaze di çareserkirina vê pirsgirêkê de roleke girîng bileyîze. Bi rastî, jixwe Iran



Serokkomarê Azerbeycanê Ebûlfez Elçîbey û Serokkomarê Tirkîye Turgut Özal

bi awayekî mecbûr e dest bavêje vê meseleyê, ji berku, bi milyonan Azerî li Iranê dijîn û zorê didin Iranê ku di vê pirsgirêkê de bibe navber an jî alikariyê bide Azerbeycanê da ku, Ermenî xwe bi paş ve bidin. Wekî din Iran dixwaze bi navberiyê, Azerbey-

canê û dewletên Tirkî bixe bin tesîra xwe. Iran ji berê ve, vê ji xwe re wek hedefekî politîk dibîne û bi vê tevlîheviyê fersend ketiye destê Iranê. Şerê navbera Azerî û Ermeniyan, wisa xuya dike wê têkilî û politîkayen nû derxe holê. Dewletên Tirkî ku heta niha

hêviyên mezin ji Tirkîye dikirin û xwe nêzîkî wê dikirin, bi helwesta Tirkîye ya li hember vî serî, plan û hêviyên van dewletên Tirkî serobino bûn û wisa diyar e ku, ji niha ve wê li têkiliyên nû bigerin û di hilbijartina dost û dijminan de wê bi dîqettir bin.

GOTIN



Yaşar Kaya

Hatina Mam Celal

Si yaset û dîplomasî germ derbas dibe. Serokê Yekîtiya Niştimanî Kurdistan Celal Telabani (Mam Celal), heftiya çûyî li Enquerê bû. Partiya Keda Gel ji bo wî û hevalên wî nanekî êvarê da. Ji Gündemê ez, ji Yenî Ülke Ferda Çetin, ji Welat ji Abdullah Keskin, em mîvanê HEP'ê bûn. HEP'ê gazî gelek Kurdan kîribû. Ji 30 salan vir ve, ev cara yekemîn bû ku, Kurd dihatin cem hev. Civîneke germ û xurt bû. Em giş dilxweş bûn.

Du sal berê, Mam Celal ji bo civîna Sosyalîst Enternasyonalî hatibû Stenbolê. Me wê carê jî hevûdin dîtibû. Her ku Serokê Partiya Karkerê Kurdistanê Abdullah Öcalan şer rawestandiye, Kurd gelek kîfxweş in. Giş

dibêjin aşitî baş e, şer bê verimandin baş e, ji bo biratiya gelên Kurd û Tirk ev şert e.

Şoreşa Kurdistanê û pêşengê şoreşê PKK, di nav 10 salan de, dengê Kurd û Kurdistanê, doza Kurdistanê anî ber çavên gelên Kurd û Tirk, anî ber çavên dinê. Ji iro pê ve, xebat ji bo demokrasî û dîplomasiyê ye. Bila dew-

Şoreşa Kurdistanê û pêşengê şoreşê PKK, di nav 10 salan de, dengê Kurd û Kurdistanê, doza Kurdistanê anî ber çavên gelên Kurd û Tirk, anî ber çavên dinê. Ji iro pê ve, xebat ji bo demokrasî û dîplomasiyê ye. Bila dew-

letên Ewrûpa jî bizanibin ku, em ne terorîst in, em ji bo azadî û serfiraziya Kurdan dixebeitin

gavavêtinê, gelek rî li ber neyaran hatine girtin. Bila dinya jî bîzanibe ku, PKK dîplomasiyê, aşitîyê û di nav demokrasiye de xebatê jî dizane. Ev qezanca me ye û zehf giranbuha ye.

Di van rojan de gelek gav hatine avêtin. Partî û rêxistinên Kurdan têne cem hev û tifaqan çedîkin. Ev dîrokeke nû ye, ne tiştekî hêsan e, ji destê kî tê bila bi gerî destê hev bigirin û bibine yek. Yekîti ji bo me jiyan e, vegetandin jî mirin e. Ev rojê han, rojê mirin û jiyanê ne.

Mam Celal li Enquerê bi gelek Kurd û Tirkân re xeber da û dîtinên xwe got. Li dîtinên wan jî guhdarî kir. Ji Enquerê jî, berê xwe da Şamê û bi Abdullah Öcalan re xeber da û kifş e ku şerrawestin dirêj dibe. Riya aştiyê vebüye. Di vê riyê de, çi bikeve ser milê kê, divê wezîfeya xwe pêk bîne. Xwîn bi xwînê nayê şûştin, xwîn bi avê tê şûştin. Di vê riyê de, xeletî bi mirina gelê Kurd û Tirk e. Em aşti dixwazin, ne mirinê.

Li Afriqa terora spian

Nûçeyen Derve- Sekreterê Giştî yê Partiya Komunist a Afriqaya Başûr, di 10'ê Nisanê de, li ber derê mala xwe hate kuştin. Bi kuştina Serokê Partiya Komunist **Chris Hani** re, reşikên Afriqaya Başûr rabûne ser piyan û bi mîlyonan karker bi banga **Kongreya Neteweyî ya Afriqa (ANC)** û **Yekîtiya Sendiqayan** ve, dest bi greva giştî kirin.

Li gelek bajar û herêman meş û xwepêşandanen protestoyê li dar ketin. Li bajarê **So-weto** û **Cape Townê**, di nav polis û meşvanan de şer derket. Di van bûyeran de 6 kes mirin. Di bûyeran xwepêşandana So-weto de. Sekreterê Giştî yê ANC'ê Sam Ntobane jî mir. **Sam Ntobane** di gullebarana polisan de hate kuştin.

Serokê ANC'ê **Nelson Mandela**, li Sowetoyê, di stad-yûmekê de, li dehhezarên gel rel banga aştiyê kir.

Li aliye din, li Cape Town'ê, ji bo bîranîna Chris Hani mera-simek li dar ket. Pireka Serokomarê Fransa **Danielle Mitterrand** û boksor **Muhamed Ali** ji besdarî vê merasimê bûn.

Şerrawestin bi şert dirêj bû

Navenda Nûçeyan- Şerrawestina PKK'ê ya ku PKK'ê di 17'ê Adarê de heta 15'ê Nisanê yekalî ilan kiribû hate dirêjkirin. Li gor Ajansa Reu-

ter'ê ku ji Bar Eliasê nûçe digihîne. şerrawestina vê carê dê ne yekalî be. Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan. di civîna çapemeniyê de. şertên şerrawes-

tinê diyar kir. Abdullah Öcalan şertên xwe wiha anîn ziman: "Divê hikûmeta Tirk jî, ji şerrawestinê re hurmet bike. Weke tê zanîn me ji 20'ê Adarê ta 15'ê Nisanê yekalî ilana şerrawestinê kiribû. Lî hikûmeta Tirk dev ji operasyonê xwe berneda. Em alîgirê şerrawestinê ne. Lî ger dewleta Tirk operasyonê xwe bidomin. Dê operasyonê me jî bidomin. Ji ber vê yekê, divê dewlet operasyonê xwe bisekinîne. Gerîla ji mîşin nîn in. Dema êrîşek biçe bi ser wan ve, dê xwe biparêzin û bersiva van êrîşan bidin. Li gorî sertan, dê mîjuya şerrawestinê diyar bibe. Dibe ku 3 roj be û dibe ku 3 meh be. Dê tewrê dewleta Tirk vê yekê tesbit bikin". Li gor ku diyar dibe, PKK di biryara şerrawestinê de samîmî ye. Divê dewleta Tirk jî, dev ji operasyonê xwe berde û samîmiyeta xwe îsbat bike.

Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan, şertên şerrawestinê di 12 xalan de tesbit kir. Li gorî vê:

1-Divê operasyonê ku bi armanca îmhakîrinê têne meşandin, rawestin.

2-Pest û işkenceya ku li ser gel tê meşandin divê dawî lê bê

3-Divê cinayetên failî-mec'hûl bêne rawestandin

4-Efûyeke bi giştî bê ilankirin

5-Mafêñ çandî bêne dayîn

6-Ji zimanê kurdî re serbes-

yan ku li KMM (IHD) ya Enquerê dimeşıya, di roja 15'ân de dawî lê anîn.

Li Girtîgeha Diyarbekirê ji 141 girtî, ev 64 roj in di greva birçibûnê de ne. Ten-

duristiya grevvanan nex weş e û dibe ku mirin çêbibin. Li Girtîgeha Konyayê, 9 girtî rojiya mirinê didomînin. Li Bucayê ji niha 60 girtî di grevê de ne.

Li Girtîgeha Mûşê, yek ji girtiyen grevvan ku, ji doza PKK'ê radiza şehîd ket. Şehîd Abdullah Fîdan, li qawîsa 2'yan dima û ji 15 rojan ve di grevê de bû. Girtiyen din cendekê Abdullah Fîdan di hundir de digirin û didin xuyan ku, ger mafêñ wan li wan venegerînin, dê ji greva birçibûnê derbasî rojiya mirinê bibin.

Li gelek girtîgehan hevdîtinê nûnerên girtîyan û râyedarên girtîgehan didomin. Lî hê tu encam ji van hevdîtinan derneketine.

Girtîgehan ku lê grevân birçibûnê didomin ev in:

Li Girtîgeha Amasyayê 12 girtî, li Ceyhanê 3, li Çanakkaleye 21, li Diyarbekrê 141, li Bûcayê 60, li Konyayê, 10, li Mêrdînê 102, li Batmanê 44 û li Girtîgeha Ruhayê ji, 9 girtî.

ti bê dayîn

7-Ên ku ji gundêñ xwe hatîne koçberkirin, ji nû ve vegerin gundêñ xwe

8-Divê rêveberiya taybetî bê rakirin

9-Zerarêñ gel bêne tazminîkirin

10-Sistema cerdevaniyê bê rakirin

11-Ji rîexistinê Kurd re legalite bê naskirin

12-Rê bidin rîexistiniya bi serbestî û siyasetê

Abdullah Öcalan, wateya vê şerrawestinê û daxwazêñ xwe wiha diyar kir: "Em di riya federasyonê de gavan diavêjin". Li gor beyana Abdullah Öcalan, ger cerdevan çekên xwe ji ber xwe ve deynin, dê bêne e-fûkirin.

Serokê Partiya Keda Gel (HEP) Ahmet Türk, Serokê PSK'ê Kemal Bûrkay û Celal Telabani ji beşdarî civînê bûn. Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan li ser hatina heyeta HEP'ê ya civînê jî wiha got: "Ew ji bo ev pêvajoya aştiyê bidome, hatine vir". Di vê navê de. Ahmet Türk ji 2 pêñûsêñ zêrîn diyarî Abdullah Öcalan kir û wiha got: "Bila çek rawestin û pêñûs biaxivin".

RIYA YEKİTİYÊ VEBÛ

Biryara şerrawestinê, di nav partî û rîexistinê Kurdan de ji, riya yekîtiyê vekir. Pişti şerrawestinê, di 19'ê Adarê de. Serokê Partiya Sosyalistên Kur-

distanê Kemal Bûrkay û Serokê Partiya Karkeren Kurdistanê Abdullah Öcalan, li Şamî li hev civîyan û protokolekî imze kirin. Bi vî awayî ji di tékoşîna rizgariya Kurdistanê de riya yekîtiyâ enîyeke neteweyî ji vebü. Dû re bi demekê, di 13.04.1993'an de, bi Hevgirtin-PDK'ê re ji protokolek hate imzekirin. Bi parti û rîexistinê din re ji danûstandin didomin.

HEYETA HEP'Ê JÎ ÇÜ CIVİNÊ

Heyetek ji Partiya Keda Gel (HEP) ji, ji bo bi Serokatiya PKK'ê re li ser şerrawestinê hevdîtinan pêk bîne cûn herêmê. Serokê HEP'ê Ahmet Türk, mebûsên HEP'ê Sedat Yurttaş, Orhan Doğan, Sirri Sakık, Hatip Dicle û Feridûn Yazar, pêsi li Şamî bi Celal Telabani û Kemal Bûrkay re hevdîtinekê pêk anîn dê dû re bi serokê PKK'ê Abdullah Öcalan re civînekê bikin. Serokê HEP'ê Ahmet Türk, armanca serdana heyetê wiha anî ziman: "Em bi irada gelê herêmê hatine hilbijartın. Wezifa me ji li gor daxwazê wan, ji bo rewşa aştiyê bidome, xebatkarin e. Şerrawestin yekalî nabe. Divê hikûmeta Tirk jî, polîtikayê xwe biguherîne. Aliyek bi tenê samîmî be, nabe. Divê aliye din jî samîmiyeta xwe nîşan bide. Daxwaza me ew e ku, herkes rewşa terorê mehkûm bide".

Ber bi yekîtiyâ neteweyî ve

Navenda Nûçeyan- Bi bang û xebatên Partiya Karkeren Kurdistanê, di riya enîya neteweyî de gaveke din jî hate avêtin. Pişti protokola PKK û PSK'ê, ya ku di 19'ê Adarê de hatibû imzekirin, niha ji di nav PKK û Hevgirtin-PDK (Hevgirtin-Partiya Demokratîn Kurdistan)'ê de protokolek hate imzekirin. Di roja 13.04.1993'an de, Heyetek ji Hevgirtin-PDK'ê û Sekreterê Giştî yê PKK'ê, civînek çekîrin û protokolek imze kirin. Di vê protokolê de ev xalêñ jêrîn hene:

1-Hevgirtin-PDK, şerrawestina PKK'ê ya bi şert û di encama vê de, vebûna riyen aşti û siyasi diparêze.

2- Hevgirtin-PDK, weke ku di protokola nava PKK û



Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan

Li Girtîgeha Mûşê girtiyek şehîd ket

Navenda Nûçeyan-

Grevên birçibûnê yêni ji bo protestokirina pest û zordâriyên li ser girtîyan ku, bi hinceta firaran têne meşandin, li 9 girtîgehan û bi beşdariya 402 girtîyan ve di meşe. Greva birçibûnê ya li Girtîgeha Meletê di roja 41'ân de dawî lê hat. Greva birçibûnê ya lêzimên girtî

Dayîka hêja Esma Uveyş Öcalan

Ji welatê xwe dûr, li xerîbiyê koç bû û çû ser dilovaniya xwe. Bila serê gelê Kurd sax be. Em dê tim dayîka sitembar bi bîr bînin.

Xebatkarêñ Rojnameya Welat

PSK'ê de ji hatiye diyarkirin, ji bo yekîtiyâ enîyekê civînike giştî pêwist dibîne û ji bo ev civîn di demeke kurt de pêk were, xebateke bi hevkâri dipejiîne.

3-Ev herdu partî, ew xalêñ ku di protokola PKK û PSK'ê de hatine ilankirin berbiçav dikin û ji bo yekîtiyâ enîyeke neteweyî guftûgoya program û rîznameyê (tuzukê), li hêviya civîneke fi-rehtir ku partî û rîexistinê din ji beşdar bibin, dihêlin û di vê navê de biryara domandina civîn û hevdîtinan digirin.

Li gorî ku diyar dibe, ev pêvajoya nû ya ji bo yekîtiyâ enîya neteweyî, dê bi beşdariya partî û rîexistinê din hin ji xurttir û bihêzir bibe.

SEDEQETÎ JI DAYÎKA UVEYŞ RE

Me sedeqeta xwe ya bi dayîkan re,
bi têkoşîna azadkirina ji bo jinan daye îspatkîrin.

Maneya hewla bêdawî ya azadkirin, meşandin,
xwedî gotin, xwedî biryar û yekûna tevan
xwedî îradekîrin a jinan, ev e.

Em bawer in ku, me bi xebatê
ji bo rizgarkirina jinan ên ji têkiliyên kirêt,
ji mengenan û ji şexsiyeta koletî,
bersiva pîroziya dayîkan daye.

Sedeqeta me ya bi dayîka Uveyş re wiha ye.

Ev sedeqet, ji hemû sextekariyan dûr e
û rûmetdayîna rasteqîn tîne zimên.

Bi vî aliyê xwe ve hem dîrokî ye
û hem jî îzahkirina heqîqetê ye.

Ev têkoşîna rakirina ser piyan a jinan,
dibe navê rûmetdayîna jinan û jiyandina
dayîka Uveyş.

**Sekreterê Giştî yê PKK'ê
Abdullah Öcalan**



Neynika ramanê mirovan, herikandina jiyana wan bixwe ye.

Montaigne

Dîwarêni di nav me de

Piştî serrawestina yekalî ji aliyê serokatiya PKK û li ser îmzakirina neh xalêna navbera PKK û PSK'ê di nav gelê Kurd de ên li Ewrûpa pîr pirs û nezelalî dîrketin holê.

Ji bo zelalkirin û bersivdayına pîrsen gel, ji aliyê berpirsiyi a rîn ERNK'ê ve civînêne gel pêk hatin.

Di roja 11.4.93'yan de civîneke mezin ji bo Kurdên bajarê Berlinê jî hat çêkirin. Di vê civînê de zêdeyi heftsed mirov amade bûn. Di nav van de, hevalbendê PSK

û gelek jî Kurdên parçeyên din cih girtibûn. Civînê bi zimanê parçekirina gel (bi Tirkî) dest pê kir. Me ji

"şâşkirêni" parçeyên din tiştek ji civînê fêm nekir, lê wisa dihat xuyakirin ku her kes dixwaze zanebûna xwe ya zimanê Tirkî, bi yên din bide îsbatkirin.

xwe re qise dikir. Milet ji wî xwest ku ew dengê xwe kêm bike. Kalemêr ji civînê derket. Em çend kes jî li dû wî derketin. Me dît ku ew jî bi Tirkî nizane û bi gehra (nerihetiyâ) xwe, bi xwe re qise dike.

Ew ji Kurdên Mêrdinê bû û digot: "Kurên min ev ne Kurd in. Ew Kurdiyyê naxwazin. Heger xwedê neke Kurdistan azad nebe, ev dikarin xwe bi zimanê Tirkî xelas bikin, lê Kurdiyyê, Tirkîtiyê dîkin." Min

Civînê bi germî dom dikir, kalekî por spî 60 heya 65 salî, diqeta civînê kişan-de ser xwe kû wî xwe bi

soz da wî ku ez van gotinan ji bo rojnameya Welat binivîsim.

Borzoo, S.D/Berlin



ME DAYÎKA UVEYŞ WINDA KIR

Dayîka gelê Kurd û Abdullah Öcalan Uveyş Öcalan ku bê şik û guman serokek herî mezin diyariyê gelê Kurd û mirovatiyê kiribû û bi vê jî derbasî dîrokê bûbû, wefat kir.

Dayîka Uveyş, bi taybetî di salêni dawî yên jiyana xwe de, bi her celeb zordariyên dewletê re rû bi rû bûbû û ji welatê xwe hatibû koçberkirin. Lî ew hertim ji têkoşîna kurê xwe ya bi rûmet, serbilind bû Bi vê rûmetdayînê li hember pest û zoran li ber xwe da û weke dayîka hemû Kurdan derbasî dîrokê bû û dawî li jiyana wê hat.

Em dê hertim wê, ji bo xelata wê ya ji me û ji hemû mirovatiyê re bi minet bi bîr bînin û vê bîranîna wê tim bijînin.

Li ser navê hemû Kurdên ku li Ewrûpa dijin: Mustafa Karasu-Kanî Yilmaz

KURD-HA, HUNERKOM, FEYKA, HEV-KOM, AGRÎ-VERLAG, Rojnameyên BERXWEDAN-SERXWEBÛN, Sentrûmên Çandî-Komîteyên Kurdistanî yên Almanya, Avûstûrya, Avûstûralya, Baçika, Amerîka, Danîmarka, Fransa, Qibrîs, Qanada, Lîbya, Swêd, Holland, İspanya, Swîsre, Îngîlîstan, Yewnanîstan, Yekîtiya Esnafê Fransa, Qlûbêni Sîporê: Botan, Cûdî, Dêrsim, Amed, Serhildan, Herekol, Gabar

TİR

Musa Anter



Şîna şehîdê welêt Musa Anter

Ey heval Anter, ey şehîd Anter
Gernas û mîrbaş, zana û rîber
Jiyana te, tev têkoşîn û şer
Pêşberê dijmin te netewand ser

Ey heval Anter rabe, roj hilat
Ban ke Sedîq û Huseyn û Wedat
Hafiz û Cengiz, şehîdîn welat
Dema xewê çûye, dema xebat

Zû rabin, werin alîkariya min
Xweş nekin li min, hûn kîfa dijmin
Ev barê giran, ma ser pişta min
Barek giran e, dûr e riya min

Barek giran e, riya min dûr e
Riyek bi tirs û zehmet û zor e
Hemî zinar û kort û şaxor e
Gur û hîrç, hawêr dîkin qor qore

Rabin, bigirin qelel û dewêt
Binivîn hûn nûçeyên welêt
Dijmin welatê me kir ar û pêt
Xwîna biçûk û pîr û jinan rêt

Bextê me û yê gelê me yê reş
Bûbûn pêşiyên me, diz û keleş
Welat tarî bûbû, wek şeva reş
Lê bo me, hilat du heyvîn pîr ges

Welat rohnî kir wan herdu heyvan
Belav bû ew tarîtiya şevan
Ew du seydan e, rohniya çavan
Pesnêwan nayê gotin bi peyvan

Yek Cegerxwîn e, yê dinê Anter
Bo gelê me bûn seyda û rîber
Ronahî kirin, welat seranser
Keda wan e ev serhildan û şer

Ey heval Anter seyda yê delal
Ji biçûkî ta bûyî pîr û kal
Ji bo me bûyî, tu find û şemal
Bûyî zimanê gelê kerr û lal

Belê dijminê tîsok û bêbext
Çavên wî kor bin, desten wî bin şeht,
Xwîna te rijand, ser axa paytext
Axa Amedê cihê tac û text

Gelê Kurd hemî ketine xema te
Reş girê dane, diquin şîna te
Sond dixwin hemî, bi vê gora te
Bernadin tu car wê rîcîka te

Sagirdê te me, ser riya te me
Barê min giran e, hemî xem e
Dijgin Mela Dîno sersem e
Lê roja min hat, ev dinya dem e.

Mela Dîno / İskenderûn

Serokê YNK'ê Celal Telabani, dema nû ji Welat re nirxand:

'Herkes aşıtyê dixwaze'

Ez dixwazim bi gera we ya Tirkîyê dest bi hevpeyvînê bikim. Ev hefteyek e ku hûn li Tirkîyê ne û bi gelek serokên partîyan û rîvebirêne dewletê re rûdinin. Armanceke we ya taybetî ya vê gerê hebû?

'HERKES AŞTİ DIXWAZE'

- Belê. Em dikarin bibêjin sê armanc hebûn. Yek, bi meseleya aşıtyê ku PKK'ê xwetsiye û Apo dest bi "ateşkes" kiriye: li gorî min prosesek aşıtyê dest pê kir li Tirkîyê. Li gor taleba (daxwaza) Serokcumhur Özal ku li ser wê meseleye axaftin bike ez hatime Tirkîyê. Di gel hemû kesen ku min dîtine: serokcumhur, serokwezir, serokê parlamanê Tirkîyê, cîgirê serokwezir, serokên partîyan, rojnamegerên Kurd û Tirk û birayen me yê Kurmanc ku, me li vir ew dîtine, me geleki behsa wê meseleye kir. Li gor têgihîstina min, herkes aştî dixwaze. Herkes dixwaze "ateşkes" dirêj bibe û herkes dixwaze bîrek bike ji bo meseleya Kurdan bê çarekîrin.

Berê tu dizanî li vî welati (Tirkîyê) digotin "Kurd tune ne, meseleya Kurdan nin e." Iro dibêjin "Heye" û herkes dibêje. "Lazim e ilaceke demokratik û siyasi jê re bê çekîrin." Li gor min ev tişteki pozitif e. Yek ev e ku, herkes aştî dixwaze. A duduyan, herkes qenaata wî hatiye ku bi şer, bi zilm û zor ev mesele nayê halkirin. Herkes bawer dike ku. Kurd li vir (Tirkîyê) hindek heqê xwe bistin. Kêm an zor (zêde, gelek) ew tişteki din e, lê wê dibêjin.

Herkesê ku min dît, ji rolâ ku em dilizin memnûn e.

'ROLA ME BAŞ DIBİNIN'

Rêvebirêne artêşa Tirk jî daxili van kesan e?

- Min hinek ji wan dît, Ev tişteki ez dibêjin giştî ye, yê hemûyan e. Herkesê ku min dîtiye, ji wî rolêne me yê aşıtyê razî ye. Min kesek nedîtiye ku gazinan dike. Herkes dibêje ev tişteki bas e. Lê hemû ne yek in.

Her yekî diquhere?

- Diguhere. Mesela, ji hemûyan ewê ku pozitif û vekirî diaxive Turgut Özal e. Bi giştî pozitif in. Prosesa (qonaxa) aşıtyê bi pêş ve dice. Prosesa çareyêni siyasi û demokratik dest pê kirîye, lê hê ji wext jê re lazim e, zeman lazim e. Lê ez wisa têdigihim ku, ev proses êdi nema vedimire.

'EZ DOSTÊ PKK'Ê ME'

Di çavê raya giştî de wek ku hûn hatine navbera PKK û dewletê çebikin. Ji bersivêne we ji maneyeke wisa derdikeve. Armanceke we ya bi vî şekîlî heye?

- Bi Xwedê ez ne navber im. Lê ez dostê PKK'ê me. Dostê ewanî ji me. Dostê Tirkan im ji.

Tistên ku PKK ji min re dibêje, ji wan re dibêjim, ku ew ji min re dibêjin ez ji PKK'ê re dibêjim. Lê bi resmî ne wisa ye.

İmajeke we ya bi vî rengî heye. Li aliyê din, di rojnameyan de hate niûsandin, dibêjin piştî hevditina we uslûba Demirel hate guhertin.

- Ez ji inkar dikim, dewlet ji inkar dike. Lî tişteki din heye ku rastî ew e: Herkes dizane ku dost û elaqatîn min li gel PKK'ê cend e. Di gel wê ji gelekî bi dostanî û germî pêşwazî li min kirin li vir. Ev bi xwe tişteki pozitif e.

'BI RESMÎ NABEJE DI FİLLİYATÊ DE DIKE'

Li gor intibayen we, dewlet

manekî wî heye. Bi rastî tişteku PKK'ê kiriye li gorî min şoreseke siyasi ye. Ev şoreseke aştî ye, şoreseke politik... Zimanê şoreşen politik û di gel şoreşen çekdar ji hev cuda ne. Li gorî min PKK gerék e vî tişti bike.

Dewlet ji gerek e şer bide sekandin. Genel afû (efûya giştî) bide. Azadiyê demokratik û mafen mirovî bide Kurdan û kultura Kurd (serbest) bike. Ew gav dewlet bavêje, ev gav PKK bavêje, prosesek demokratik, çareyêni siyasi wê vebin.

Heta niha imaja ku dewlet daye, imaja resmî hinekî hisk xuya dike. Herkes dizane ku, Tirkîyê ne wek berê difikire lê aştî ji ne hesan e. Ger Tirkîyê vî

aştî û mafen mirovan bê cebecekirin. Dewleten Rojava, Amerika û Japon ewqas ku ez têdigihim û min wan dîtiye, hemû alîkarê aştîye ne. Hemû dixwazin bi aştî meseleya Kurdan bête çarekîrin. Kes şer naxwaze û muşkulanen Tirkîyê bêhtir çav bikin. Ji ber vê ez hêvî dikim Amerika, Ewrûpa, Japon ew dewleten ku dôstên Tirkîyê ne, ji wan re bi şeweyke hevalane nasîhaten dostane bikin û bibêjin ku vê rî bigirin. Riya aştîye, demokrasiye û riya biratiya Kurd û Tirkan.

Hin kes idia dikin ku, şersekinandin ev pêvajoya nû tamamen ne bi insiyatifa welatên Rojava be ji ne bê xebera wan e.

- Belê hinek cepê mepê me

min re digotin: "Telabani te çawa kiriye, ev risk e te kiriye". Digotin: "Ne mumkun e, Apo tişteki wisa bibêje."

Min digot: "Na! Mumkun e." Wextê Apo got, gotin: "Wele tu baş pêşbin i, dîtinê te baş in." Heqiqet ev e. Ne mîna hînek cepen me dibêjin.

'ÖZAL Ü BAYKAL NERM IN'

Ji ber ku idia dikin min pirsi...

- Ez dixwazim hûn vî tişti binivîsin. Cara pêş, wextê ez çûme Samê, sefûr ew min diditîn, min digot: "Tişteki wisa heye."

Herkesi ji min re digot: "Ev risk e, rîskeke ne baş e." Min digot: "Na, ne risk e. Ev rast e." Digotin: "Nake!" Min digot: "Na! Dikel!" Wextê kir gotin: "Wele ev tişteki baş e." Heqiqeta meselê ev e.

Li Tirkîyê, di nav hikümet û muhalefetê de, li gor ditina we, kî néziki çareserkirina pirsigirêkan e? Kî ji guherinê civaki re vekirî ye, nerm e?

- Hemû di nav dilê xwe de jê hez dikin. Lî ji hemûyan nermtir Özal e. Di nav muxalefetê de, ji hemûyan néziktir Deniz Baykal e.

Berê ji we gelek ji van serokan dîtibûn. Li gor berê rewşa wan çawa ye, guherine?

- Guherine! Gelekî hatine guhertin. Ji min xeyidibûn, ji ber ku wextekî min gotibû: "PKK mîvanê me ye li Iraqê." Digotin: "Çawa mîvan in, ev terorist in, nizam ci..." Iro ez dibêjin, ez çûme nik Apo. Apo hate nik min. Em rûniştin, me hevdu dît. Kêfa wan tê. Tiştin hatine guhertin. Berê digotin: "Mesela Kurdan tune." Iro herkes dibêje: "Heye û lazim e riya demokratik vebibe." Berê ji tohmeteke ku ji min dihate kirin, digotin: "Vesartî elaqetên Telabani û Apo hene." Iro alenî heye û kes nabêje na! Guherandin gelek e.

'MİLET HİSYAR BÜYE'

Hûn dikarin der heqê Dewleta Federe ya Kurd, rewşa siyasi, ekonomik, civakî, çandî de, me agahdar bikin?

- Li Kurdistanâ Iraqê hilbijartin çebû. Endamên hilbijartinê 105 kes bûn. 5 kes birayen me yê Asûri bûn, ew hatin bijartin. 4 ji wan ji partiyeke bi navê "Tevgera Demokratik a Asûri" bûn, partiyeke demokrat û cep e. Ê din ji Asûrekî demokrat e. 50 mebûse PDK'ê ne. 50 ji yê YNK'ê. Koalisyon çebû. Serokê meclisê ji PDK'ê ye, wekil ji YNK. Serokê wezîran Yekîti ye, wekilê wî PDK. Wezareta me koalisyon e. Di gel YNK û PDK'ê cend partiyen din ji tê de hene. Partiya Komunist a Iraq-îliq Kurdistanê tê de heye.



"Meseleyeke Kurmancen me heye, dibêjin: 'Ê nav dilê te ji min re, ne yê ser zarê te. 'Ê nav dilê te ji min re.'

der heqê şer-rawestinê de ci difikire?

- Li gor intibayen min eger "ateşkes" dirêj bibe, dewlet ji wê şer bide sekandin. Bi resmî nabêje, di fiiliyatê de dike.

Em dikarin bibêjin çek piştî 15'ê Nisanê ji nateqin?

- Hêvî dikim wisa be!

Ji bo vê, divê herdu ali, PKK û dewlet ci bikin? Dîtina we ci ye di vî ali de?

'PKK ŞOREŞEKE SIYASİ KIR'

- Li gorî min gerek e PKK şer bide sekandin. Mecal nede ku kesek bi navê PKK'ê provakasyonan bike. Bi zimanekî nû, bi raya giştî ya Tirkîyê re danûstandin bîke. Zimanekî ku raya giştî ya Tirkîyê destigîhe. Tu dizanî her zemanekî wî heye. Şer, zimanekî wî heye, şoreşen çekdar zi-

tevrî bidomîne wê ci tesîrî li têkiliyên we û Tirkîyê bike, dev ji metodên leşkeri bernede wî çaxî wê tewra we çawa be? Tewra we meraq dikim. Li gor dîtinê we tewra welatên Rojava, Rojhîlat wê çawa be?

- Berî her tişti lazim e ez tişteki bibêjin. Meseleyeke Kurmancen me heye, dibêjin: "Ê nav dilê te ji min re, ne yê ser zarê te. " Ê nav dilê te ji min re. Ev yek. A duduyan, ez hêvî dikim piştî ku PKK "ateşkes" dirêj kir, dewleta Tirk şer neke. Cîma, wî çaxî şer ji Tirkan re gelekî xerab e. Raya giştî ya dînyayê, Ewrûpa, Amerika, Japon herkes wê wî wexfi webal, mesûliyetê têxe ser stûyên wan û ev ji wan re ne baş e. Ji ber vê ez hêvî dikim, mesûlên Tirk ku mirovîn siyasi ne, mirovîn hêja ne vî şerî nekin, yanê şer bidine sekandin.

Dewra me ew e ku demokrasî,



İsmail Beşikçi û Celal Telabani

Di wezareta nû de wê nûnere-
ki Turkmenan hebe. Ji aliye siyasi
ve waziyet baş e. Milet hisyar bû-
ye. Azadi û demokrasi heye. Roj-
name. radyo. televizyon hene.
Mîna Ewrûpa azadî temam hene.

'LI BAŞUR 5 TV'

Cend televizyon hene li Ba-
sûr?

- Televizyonen 5 partiyen he-
ne. Yekiti. Partiya Gel. Komu-
nist...

Her roj cend saetan weşanê
dikin?

- Li gor qudra wan partiyen
e. Mesela Yekiti rojê 8 saetan.
Partiya Gel 6-7 saetan. televiz-
yon bi reng in. Niha em dixwazin
televizyonen mezin. ji Zaxo heta
Kurdistan Bakur. ta Diyarbekir.
Wanê. ta Qamışlo. Helebê dice...
15 hezar watt quweta wê ye.
Radyo bi zimanê Kurmanci. Tirkî
û Erebî axaftin dike. Rojname he-
ne. Yek rojname her roj derdi-
ke: Kurdistan Nû.

Her roj an ji hefteyekê bi ro-
jan?

- 6 roj. Roja 7'an bi Erebî bi
navê El-İttihad (Yekiti) derdi-
ke. Partiyen din ji rojnameyên hefta-
ne an heyyane (mehane) derdêx-
in.

Rojnameya Kurdistan Nû
li Başur tev de belav dibe?

- Belê.

Ziman giştî bi zaravayê Sora-
ni ye. tiştî ez dizanim...

- Giştî Soranî ye. lê Behdînî ji
tê de heye.

**'HETA UNIVERSITEYE
KURDÎ'**

Tedrisat (Perwerdekarî) çawa
ye?

- Tiştî din maye. ji we re
bibêjim: Qismekî Kurdistanê di
destê me de ye. Hinek bajar ma-
ne. mîna **Şingal, Inzalê,
Şexan, Rojhilatê Musil,
Mexmûr û Kerkûk, Tuxa-
mat û Kufri, Daqiq, Xani-
qîn, Mendeli, Bedra...** Ev di
destê me de nîn in. di bin destê me
de 3.5 milyon (sê milyon û nîv)
Kurd azad in. Di medresê de bi
Kurdi tê xwendin. Li universtîte ji
Kurdi û zimanê din hene. Heta
niha 3 universtîte hene li nik me:
Universita Selahaddin li Hewlêre.
Universita Duhokê: îsal li Duhokê
vebûye.

Ev universtîte bi bêhtirin li
ser ilmîn civakî dixebeitin an li
Têkiliyên we û parçeyen
welêt ê din û Kurdên derive çawa
ne?

ser ilmîn fenni?

- Her tiştî heye. Doktorî heye,
muhendisi. ilmîn sosyal. siyaset...
Qasî fakulteyeke xususî ji bo Kur-
dî. mîjuya Kurd. zimanê Kurd. e-
debiyata Kurd. diroka Kurd... Zi-
man heta bi universtîteye Kurdi-
ye. Universite ji Kurdi an Erebî.
an Ingilîzi ye.

**'TÜRKİYE ÇI BIKE BI KÊFA
XWE YE'**

Piştî ilankirina Dewleta Fe-
dere ya Kurd. Sûriye. Türkiye û
Iran li hev rûniştin. Türkiye sefa-
reta xwe ya Bexdayê vekir. Hün
van têkiliyên van her sê dewle-
tan çawa dinirxînî?

- Vekirina sefareta Tirkîye li
gorî me. ne karekî baş bû. Bi ras-
ti ev ne gaveke demokrat bû. lê
ev şuwlî wan e. Em nikarin
bibêjin cîma hûn wisa dikin. Ci
rike. bi kîfa xwe ye.

Mesela din. wextê me dewleta
federal ilan kir. her sê dewlet xe-
yidîn. Reaksiyonen wan tund û
tûj bûn. Lê hêdi hêdi me ji wan re
da sert kirin.

'MÎNA BERÊ NE TÛJ IN'

Ji xeynî van dewletan li Roj-
hilat tu dewletan din xeyidin?

- Na. kes nexeyidi. Hêdi hêdi
xeyidîna Sûriye û Tirkân kêm bû.
Iran ji piçekî kêm bû. Gava ez li
vir bûm. min ji Süleyman Demîrel
re got: "Ne hewce bû hûn wezirê
xwe bi rê kin. di gel wan wezirê
Sûriye û Iran rûnin. Em dost
bûn. Tiştî hebe hûn dikarin ji
me re bibêjin. Em naxwazin ji I-
raqê veqetin. Em dixwazin di nav
Iraqê de federasyoneke demokratîc
çekin. Cîma hûn wextê xwe
dikujin. vî tiştî dikin." Ne got: "Ne
wisa." Got: "Ez têdigihim tu ci
dibêji." Ev wisa ye. Sûriye ji. ji
min re gotin: "Niha ji me re xuya
bû hûn parçekirina Iraqê naxwazin."
Edî em niha dikarin bibêjin
ku Tirkîye û Sûriye piçekî nerm
bûne. Ne mîna berê tund û tûj in.
Ú ev mesele. mesela heq û rewa
ye. Mesela heqê me ye. Hêdi
hêdi ev fikir dimese.

Tecrubeyen me yê berê:
wextê me otomîm ilan kir. qiyâ-
met rakirin. Pişt re herkesi qebûl
kir.

**'ŞERÊ NAVA KURDAN
QEĐIYA'**

Têkiliyên we û parçeyen
welêt ê din û Kurdên derive çawa
ne?

- Hêviye me ew e ku. her
parçeyen Kurdistanê di nav dewletan
ku iro hene mafêna xwe yê azadî
û demokrasi. tiştîn ku ew dixwazin
bi dest bînîn û partiyen Kur-
distanê di nav xwe de cepheyekê
çekin. Ji xeynî cepheyê ji. dikare
kombûn çebibe. kombûnen millî
û danûstandin xwe bikin.

Em wisa dizanin ku. iro em ni-
karin sînorêna dewletan bidine gu-
herandin. Bifikire ji Tirkîye ta
Çin: Tirkîye. Iran. Iraq. Afganîs-
tan. Pakistan. Hindistan hemû
dewletan çendî mîlet in. Ev roj ne
mîmkun e. ev dewlet hemû parçe
parce bibin û ji nû ve sînorêna din
çebibe. Em Kurd iro nikarin vî
tiştî bikin. Her parçeyen Kur-
distanê dikare li wê dewletê bixe-
bite. ji bo mafêna demokrati. mirovî û
tiştîn dixwaze. Em li Iraqê ji bo
federalê dixebeitin. Iran dawa oto-
nomi dike. Li vir va PKK û PSK
di protokolê de dawa federasyo-
neke demokratîc dikin.

Hinekî ku "Welat" serê me
kiribû min dîtiye (em tev de dike-
nin) edî min nedîtiye. Wexta li ser
me dîni visand me dîtiye. edî ne-
hate nik me. Ji me re bi rê bikin.
Li ser zimanê wê hûn ci difi-
kirin?

- Baş e. ne xirab e. Bi rastî ne
xirab e ziman. baş e. Li gor wazê
Kurdên Tirkîye baş e. Ji nû ve
hûn ber bi Kurmanci ve dicin.

Ev universtîte bi bêhtirin li
ser ilmîn civakî dixebeitin an li

Sûriye daxwaziya mafêna zi-
man. insani û tiştîn wisa dikin.
Zêdetir naxwazin. Edî ev mesele
girêdayî her parçeyekî Kurdistanê
ye.

**'EM JI HER TIŞTİ RE
HAZIR IN'**

Di van rojên pêsiya me de.
rêxistinê bakurê Kurdistanê ji
bo cepheyekê neteweyî têne ba
hev. Di pêş de mirou wê karibe
rêxistin û partiyen hemû parçey-
yan û Kurdên derive. di cepheyekê
neteweyî de li cem hev bi-
bîne? Tu hêviya we heye?

- Li gor min ewil ew e ku. her
parçeyek pêşî cepheya xwe çebî-
ke. Pişt re bi hev re rûnin. her
çar. her pênc parçe bi hev re rû-
nin bizanîn cephe çebîkin. biza-
nin kongre çebîkin... Berî ku ew
rûnin. danûstandin xwe bikin.
em nikarin ji wan re bibêjin wisa
bikin. Ev nabe tiştî demokratîk.
Bila ev kombûn çebîbin. wî wexti
dikarin biryarekê bistînin. Em
Kurdên Iraqê bi her tiştî hazin in.

"Kurdistanek serbixwe û
yekbûyi." Ev hevok ji we re tê ci
maneyî? Ci ifade dike?

- Xewneke xwes. xewneke
xwes...

'AKADEMIYEK PÊWIST E'

Niha li Başûr alfabeyle Erebî
tê bikaranîn.

- Li hebekî Iranê û Sûriye ji...
Sûriye hêdi hêdi vedigere La-
tinî.

- Giştî ew e...

Kurdên Tirkîye, ên Ewrûpa
Latinî bi kar tînin.

- Kurdên Tirkîye Latinî bi kar
tînin. Sovyet alfabeyle Rûsi...

Ew ji hêdi hêdi alfabeyle Kirî-
li diguherin. Ji bo xebatên kul-
turî çavé herkesi li Başûr e. Ji
bo alfabe. ji bo yekîtiya zîmîn
gerek e mirov ci bike. hûn ci di-
fikirin?

- Ji bo yekîtiya zîmîn gerek e
mirov akademîyek çebike. akade-
miyeke Kurdan. li Kurdistanê û
zimanen me di wir de bixe-
bitin. zanibin çawa zimanê me yek
bikin. Alfabeyle Erebî û ev geleki
behs dikin. tê bîra min ez zaro
bûm ev mesele dihate behskirin.
Ew ên ku ziman dizanin dibêjin:

"Alfabeya Latinî ji bo zimanê
Kurdi baştir e. ji yê Erebî." Cîma?
Hinek herf hene mîna piç. gav.
vî... di Erebî de tune. Hinek deng
hene û min. jin. kin ev deng bi E-
rebî nayîn nivisîn. Pirraniya zi-
mananen Kurdi. dibêjin herfîn
Latinî ji me re baştir in. lê tiştî
heye: Kurdên Iranê û Iraqê gele-
kî tiştî bi xetê Erebî nivisandine.
Nîkarin bi lez. hemû wan tiştan bi-
din hev.

**'GUHERANDINA ALFABÉ
NE HÊSAN E'**

Li Bakur ji heye. medrese...

- Mesele heger tu niha biçî
mektebê qedim è Tirkîye tiştîn
qedim berê hebûn. bi herfîn Erebî
ye. Bi hêsanî çenabe. Tiştî
din heye li nik me: Em misilman
in. mîletê me misilman e. Quran
zimanê wi ye. Quran Erebî ye.
Mirov nikare bi hêsanî vê alfa-
beyê bide guherandin. Li gorî
min gerek e em li Kurdistanê aka-
demîyek vekin. Ew akademî mi-

jûlî vê meseleyê bibe û halekî jê
re bibine.

Pirseke şexsi dixwazim bipir-
sim: Ev demeke dirêj e hûn ði
nav têkoşîna neteweyî de ne. se-
rokê partiyekê ne. Hûn hîc
wexti dibînin ku bi edebiyata
Kurdî re. şîra Kurdî re. bi kul-
tura Kurdî re eleqedar bibin?
Mesela hûn kîjan şâîre Kurd. ni-
viskarê Kurd nêzî xwe dibînin?

- Ez gelek şâîren Kurd nas di-
kim.

Em dizanin İbrahim Ahmed
xezûrê we ye.

- Mamoste İbrahim Ahmed e-
wel şâîrekî pêşverû yê Kurda ne.
Sala 1933. 60 sal berê şîrîn bas
nivîşandiye. Nivîşkarê çîrokên
dirêj e. Roman. te "Jana Gel"
xwendî ye. berî wê çîrokên kurt
nivîşandiye.

Edî şâîren mezin gelek in li
Kurdistanê. Goran yek ji wan şâîrî
mezin ê me ye. Li Iranê He-
jar. Hejar Mukriyarî...

'NE GUL BAQLÊ GULAN'

Hûn kîjanî nêzî xwe dibînin?

- Tu dizanî ez ji te re tiştî
bibêjim. Di meseleyen şîr û edeb
de hêmanê min bi çepkê gul e.
ne bi gul. Ez ji çepkê gul hez di-
kim. Deh gul ji yek gulê baştir e.
15 ji 10 gulê cêtir e. Tu dizane
çepkê gul ci ye?

Belê. belê...

- Bûkê gul... İro. di vî zemanî
de Şérko Bîkes ji xwe re nêzik di-
bînim. Şérko Bîkes li gorî min
şâîrekî geleki mezin ê Kurdan e.
Niha wezirê çandê ye. Dostaniya
min bi pirraniya şâîren Kurdan re
heye. Mesela Cegerxwîn. dosteki
min bû. Min wî baş nas dikir.

Li Bakur?

- Li Bakur bi xwedê min wî di-
tiye. Wan salêni dawî. min hinek
şîrîn Mamoste Kemal Burkay
xwendîye. Weki din min tu kes
nexwendîye. Em bibêjin maalesef
agahê me ji Bakur nîn e. lê Iranê
ez naş dikim. Mesela Hêmin heye
şâîrekî mezin bû. Hejar heye. şâî-
rekî mezin e.

'ŞERKO BÊKES NÛ YE'

Car bi caran em şîrîn wan
çap dikin? Şîrîn Şérko Bîkes
hûn çawa dinirxînî?

- Şérko Bîkes tiştî nû ye.

Teknikâ şîra wî ji geleki xurt
e. ne naverok tenê. Usluba wî
xwes e. şîreke "nûjen" e.

- Rast e. Ne her naverok. go-
tinî wî... Bi rastî şâîrekî geleki
mezin e.

Hûn "Welat" dibînin. dixwi-
nin?

- Hinekî ku "Welat" serê me
kiribû min dîtiye (em tev de dike-
nin) edî min nedîtiye. Wexta li ser
me dîni visand me dîtiye. edî ne-
hate nik me. Ji me re bi rê bikin.

Li ser zimanê wê hûn ci difi-
kirin?

- Baş e. ne xirab e. Bi rastî ne
xirab e ziman. baş e. Li gor wazê
Kurdên Tirkîye baş e. Ji nû ve
hûn ber bi Kurmanci ve dicin.

**Heppevîn:
Abdullah Keskin**

PÊNÛS

Amed Tigris



Dîrok û mîtolojî

Pêwist e ku mirov bi bîr û bawerî û bi metodê zanyarî li bûyeran binêre. Bûyeran bi gotin û termînolojîyên zanyarî ifade bike. Ev prensib ji bo her kesê zanyar û neteweyên nûjen derbas dibe. Helbet ji bo me Kurdan jî. Heta pêwistiya me Kurdan bêhtir bi nêrîn û metodê zanyarî hene. Divê em Kurd li dîrok, bûyer û kirinan, bi metodeke zanyarî binêrin û analîz bikin. Ji wan bûyeran yek jî Newroz bi xwe ye. Hinek kes û derdor carnan bi nezanî û carnan jî bi zanabûn, dîrok û bûyera Newrozê serobino dikan. Ji wan kesan ew e ku, xwedêgiravî zêde Kurdperweriyê dikan. Lî nizanîn ku, ew bi xwe bi van bîr û bawerî û helwestêr xwe, zerarê didin Kurdperweriyê. Zerarê didine doza Kurd û Kurdistanê.

Çawa û çima?

Ev kesen wiha dinivisin û idia dikan ku, çîroka Newrozê berî zayînê (Berî Isa) di sala 612'an de dest pê kiriye. An Newroz dikeve

2500 saliyî xwe...

Mirov nikaré bûyera
Newrozê wek bûyereke dîrokî ya diyarkirî destnişan bike. Ev ne rast e.
Tu têkiliyên vê dîtinê bi rastî û zanyariya dîrokê ve tune ye. Newroz mîtolojî ye. Mîtolojî, gotineke Yewnanî (Grekî) ye. Yanî bi Grekî çîrok an jî efsaneyâ dîrokî ya ku bi motîvén dînî hatiye xemilandin re, dibêjin mîtoholojî. Di mîtolojîyan de, bûyeren xwezayê (naturê), qehreman û qehremaniyê dûrî eqil û mezin hene. Mirov dikare bibêje pirraniya naverokên mîtolojîyan, dîn e.

Lî, yêr derî dînî jî hene. Wek mîtolojîya Newrozê. Marks der heqê mîtolojîyan de wiha dibêje:

Mirov dema bûyeren xwezayê bigire însiyatîv û kontrola xwe, wê demê mîtolojî ji navê radibin (*)

Di bingeha xwe de Newroz, ji dînê Zerdeşt ji Axura-Mazda tê. Di dînê Zerdeşt de agir pîroz e. Xweza (natur) pîroz e. Roj û ax pîroz in. Qanûn û prensibên xwezayê derbas di-

bin.

Wiha diyar dibe ku, di terminolojiya zanyarî de mîtolojî ne bûyereke dîrokî ya bi diyar e. Yanî sal, meh, roj û cihê wê ne diyar in. Dibe ku rast be û dibe ku ne rast be. Xelkê li gor daxwaz û dilê xwe çêkiriye. Lî kêm û zêde kiriye. Jê re qehremanîn mezin dîtiye. Ji ber vê yekê jî, gelek motifîn mîtolojîyan hene. Newroz jî her wiha ye. Yek dibêje di laşê Dehaq de kul û birîn derketine. Yekî din dibêje na di ser herdu milêne wî de mar derketine. Yekî din dibêje Şeytan ew xapandiye û gotiye rojê, serê du zarakan jêbike û mejjîyen wan di laşê xwe de bide, dê tu rehet bibî. Iranî jî tişteke din dibêjin. Heta çend salê berê Kurdan Newrozê jî derî naveroka siyasî jî bi awayeke dînî bi kar dianî. Ev hemû taybetiyê mîtolojiya Newrozê ne. Di mîtolojîyên Asûr, Misir, Grek, Iran, Roma, Sumer de, ev taybetî hene. Newroz ne dîrok e. Mîtolojiya dîrokî ya Kurdan e. Kurdan form û naverokeke politîk û civakî dane pê.

Divê em Kurd tiştên rast û zanyarî binivisin. Em xwe nexin rewşa nivîskarên Tirk, Ereb û Ecem ên ku li dijî zanyarî û rastiyê pêñûsên xwe bi kar tînin. Û ew dîbin pêkenokên xelkê. Bi awayekî zanyarî ferqa bûyeren dîrokî û mîtolojî bîbînin û wan jî hevdu cuda bikin.

* Marks û Engels, Berhevokên Giştî, pirtük 12

Çend taybetiyê berhemê edebî

NAVEROK

Di berhemê edebî de, divê armanc baş diyar û zelal be. Armanc ne ku, bi tenê Kurdi nivisandin be. Problemên civakî, sosyal, psîkolojîk, politik û hwd. bigire dest.

Naverok rojane (aktuel) be. Bi problemên civakê ve girêdayî be. Bal (motivasyon) roleke mezin dilize. Babet divê bala xwendevanan bikişine. Bi serûven û çalak be. Berhemê monoton bala xwendevanan nakişine. Bi teswîr be. Bi goşt û jiye be. Berhemê ziwa, rîjî, rût û req ên ne heja ne.

Li gor dema ku mirov tê de dijî, naverok jî tê guhertin. Jiyan naverokê diguhere. Civak bi daxwaz û pêwistîyên xwe naverokê diguhere. Mînak heger tîmîn taybetî her roj biavêjin ser gundiyyêr-Kurd, an jî polîs, leşker û şeytanok her roj çekêن xwe bixin ser û sînga ronakbîr, xwendekar û esnafêr bajariyêr-Kurd, di demeke wiha de mirov nikare bi tenê behsa **Balzac**, **Shakespeare** an jî **Menduh Selîm Begê** bike. Mirov nikare babeten çîrokên xwe li ser zordariya dema **Şêx Seîd** ava bike. Ew gelê ku niha di bin gulebarana panzer û helikopteran de ye, tu jê re di çîroka xwe de bibêjî, di dema **Şêx Seîd** de. li filan gundi eskerê Tirk Kurdeki kuşt. Berî her tişfî tu helikoptera ser serê wî kesî û panzera ku devê lûleya topa xwe xistiye sînga wî binivise û ji aliye din ve jî, behsa dîroka Kurd jî, jê re bike. Behsa dema **Şêx Seîd, Dêrsim, A-girî, Geliyê Zilan û Helepçeyê** jî bike. Mirov dikare behsa wan jî bike, lê jî derî wê, wek ku nivîskar ne jî vî gelên belengaz û çewsandî be. Wek ku ne di dema xwe de bijî, an jî bi zanabûn çavên xwe ji gel û welatê xwe re bigire. Wek ku ew di cihana xeyali de be. Bi ser de heger mirov navê vê yekê jî bike "nûjentî". Gelo ji jiyan û rewşa gel dûrkentin an jî bîrkirin nûjentî (modernî) ye? Ev efsanetî ye. Efsanen dinivisin. Li dijî edebiyata gel û şoşergerî reaksiyon nişandan e. Bi ditina min ev kopya Ewrûpiyan e. Nivîskarên Ewrûpi van tiştan dîkin û dinivisin. Lî, rewşa gelê Kurd û Ewrûpayê ne wek hevdu ne. Edebîyat, li gor rewşa gel ku tê de ye dibe. Edebîyat zimanê jiyanâ gel e. Siya jiyanê ye. Mirov nikare gel û jiyanâ wî ji hevdu cuda bike.

ZIMAN

Her cureyê nivîsarân zimanekî xwe yê taybetî hebe. Divê zimanê berhemê edebî, zimanekî nerm, bi aheng û lîrik be. Ew ne wek zimanê propaganda û a-jîtasyonê vekirî û raste-rast be. Wê demê berhem, nirx û hêjbûna xwe ya edebî winda dike.

Lî, divê nivîskar bi zimanekî nerm, aheng û lîrik armanc, daxwaz û hêviyêr xwe di nav bûyeran de bi hunermendî bihône û nexş bike. Yanî bi awayekî edebî û vesartî wan bîne zimên.

Divê ziman sade û sivik be. Hevok kurt bin. Hevok bi gotinê pêşîyan, biwêjan, mînakan bêne xemilandin. Xelek bi hevdu ve girêdayî bin. Wek rûnê helandi yê ku dirije erdê, divê bilive. Biherike. Zimanekî çêkirî û mekanîk, xwendevanan ji xwendinê sar dike. Di roman û çîrokan de, bikaranîna demen lêkaran jî gelek girêng e. Divê demen lêkaran hevdu bigirin. Di hinek çîrokên Kurdî de, dema mirov li dema lêkeran dinere, bê serüberiyek heye. Di du hevokên li dû hev de demen lêkeran hevdu nagirin. Di hevokê de lêker, dema boriya berdest (şimdiki zamanin hikayesi), di hevokê din de dema boriya dudar (mişli geçmiş) an jî boriya têdeyî (dili geçmiş) ye. Di vî warf de li pirtûka çîrokan a **Firad Cewerî** ya **Kevoka Spî** binêrin. Hema hema di hemû çîrokên wî de, demen lêkeran hevdu nagirin. Her wiha di romana **Mehmed Uzun** a "Tu", "Kalekî Rind", "Siya Evînê" û yêr **Mahmud Baksî** "Hêlin" û "Gondikê Dono" de jî demen lêkeran. cuda ne. Cudabûna demen lêkeran ahenga xwendinê xerab dike. Xwendevan ji xwendinê sar dike û dibire. Tekrarkirina gotin û teswîran ji hêjabûna berhemê dixe. Di vî warf de Siya Evînê berhemeke berbiçav e. Di "Siya Evînê" de gelek caran teswîr hâtine tekrarkirin. An jî di teswîren cuda cuda de eynî rengdér hâtine bikaranîn.

HONANDINA BÜYERAN

Divê bûyer bi hevdu ve girêdayî bin. Belav û bê serüber nebin. Di hinek berheman de mirov dibîne ku, eleqeya bûyer û paragrafan ji hevdu tune ne. An sê-çar rûpel paragrafek e an jî her hevok paragrafeke.

KAREKTERÊN LEHENGEN

Karekteren lehengan gelek girêng e. Divê şexsiyeteke wan ê taybetî hebe. Berhemê klasik û yêr bi nav û deng, pirraniya wan ji taybetiyê karekteren lehengan tê. Mesela **Oblomov** bi serê xwe bûyereke edebî ye.

Don Kîşot ji her wiha ye. Taybetiyeteke karekteren lehengan roman ji yek jê ev e ku, pirr karekteri hebe. Ew xwedî karekteren cuda cuda bin. Li gel yê pasîv û xerab, ên baş û çeleng jî hebin. Mirov vê rengîn û dewlemdiya lehengan di romanen Kurdî de nabîne. Yek karekter heye. Ew an leheng, çalak û jêhatî ye an jî pasîv û belengaz

e. Xwedî lêxistî ye. Perîşan e. Li romanen Mehmed Uzun binêrin, hemû lehengen wî pasîv û belengaz in. Ew bêhêvîtiyê belav dikan. Di romanen wî de, lehengen ku karekteren wan li dîber hevdu bin û di nav wan de têkoşin û hêvi hebe, tune ne.

NASKIRIN Û RASTNIVISINA CIH Û DEME

Rastnivisina cih û dema berheman gelek girêng e. Naskirina herêmê skeleta berhemê ye. Mesela heger mirov **Sipanê** **Xelatê** nebîne û bi nêçîra pezkuvyan nizanibe, dikare binivise "li Sipanê xelatê bi hespan cûn nêçîra pezkuvyan..." (li romana **Mehmed Uzun** a **Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê** binêrin.) Halbû ku pezkuvî li ciyayen herî bilind û asê dijîn. Mirov çawa dikare bi siwarî di wan ciyayen bilind û asê de bigere. Ka bila nivîskar bi peyati here, ew bi xwe dikare here cihê pezkuvyan an na?

GIRÊDANA BÜYER, BEŞ Û PARAGRAFAN

Berhemê herî baş, ên li ser jiyan û probleman dema xwe ne. Dema ku mirov tê de dijî. Ji bo xurtkirin û rastnîşandana dema xwe mirov dikare vegere dema borî jî. Divê romannîvis û çîroknîvis dema borî, ya têde ya dahatû (Dema bê) bi hevdu ve girê bide. Bihone. Li sedemî dîrokî yê bi hevdu ve girêdayî bigere. Serçavîyen probleman di nav dîrokê de bibîne. Hinek kes çîrok dinivisin. Heger çîroka wan du rûpel be, rûpela pêşî şîrove û analiza politik e. Rûpela dawî jî hinek bêhna çîrokê jê tê. Heta mirov di hinek çîrokan de çend cureyên edebî dibîne. Hem çîrok e, hem serpêhatî ye, hem bîranîn e. Hem ger û gest e. Bi kurtasi her tiş e. Di çîrokekê de, her cureyên edebî hene. Heger li ser pirtûk an nivîsarân xwe "çîrok" nenivîsin, mirov hezar şahidi jî bîne, nizane ku ew çîrok in. Di vî warf de, dîsa mirov dikare li çîrokên Firat Cewerî û **Lokman Polat** binêre.

XEYAL Û RASTI

Divê di berheman de, ne bi tenê rastî hebe. Divê xeyal ji hebe. Fantazî hebe. Ev fantazî caran berhemê dewlemendî dike. Xeyal, bîranîn û rastî divê di nav hev de bi hunermendî û hostatî bîn honandin û nexskirin. Di vî warf de, di romanen xwe de Mehmed Uzun û di çîrokên xwe de ji **Bavê Nazê** serkeftî ne. Rastî û xeyalan di nav hevdu de dihonin. Metodên nûjen bi kar tînin. Mirov ev huner di berhemen **Şahîn B. Sorekli** de ji dibîne.

M. Xarpeti

Hunermendê welatparêz Ozan Şemdin:

'Pêwistî bi xebata profesyonel heye'

Ji kerema xwe hûn dikarin xwe bi xwendevanen rojnameya me bidin naskirin?

- Berî her tîstî ez silavên rizgariya neteweyî. ji hemû xwendevan û xebatkarênen rojnameya Welat re disînim û di her warî de. serkeftin û serfiraziya wan dixwazim.

Ez di sala 1953'an de li Qersê. navceya İdirê. gundê Panikê (Özdemir) hatime dinê. Rewşa malbatâ me ya abori (ekonomi) ne xerab bû. Min tenê dibistana seretayî (ilkokul) kuta kiriye û dû re me li metropolen Tirkîyê dest bi kar kir. Sala 1986'an. ji bo pîrsen ekonomî ez cûm **Libya** û li wir ez rastî gelek tiştîn nû hatim. Bi alykariya hevalan min tevgera rizgariya neteweyî nas kir û têgihîstim ku. divê mirov pîr bi aktiv ji bo guhertina civakê kar bike. Li Libya min di alyê hunerî de gelek xebat dikirin. li wir di nava **Koma Karker** de me gelek stran û awazên nû çekirin û qaseteke muzikê û helbestan me li wir amade kir. Pişti wê yekê ez demekê hatim Rojhilata Navin û ji wira ez di destpêka sala 1989'ê hatim Ewrûpa. Di nava Yekîtiya Hunermendêne Welatparêzen Kurdistanê - **Hunerkom** de. me cihê xwe girt û heta vê rojê ji di riya pêşxistina çand. huner. muzik û hwd. de. em kar dîkin.

Baş e. hûn bi muzikê dixwazin ci mesajê bidin gel?

- Dîroka gelê me. li hemberi dagirkeran. dîroka berxwedanê ye. Lê belê. heta vê gavê hîna ji alyê muzikê ve me bersiva wê berxwedanê nedaye. Niha tevgerê hûneri ya mezîn heye ku. dixwaze mejiyê civaka me li gorî demê bide guhertin. Ez xwe parçeyê wê mekanîzmeva guhertin û pêşvebirina civakê dibînim. vê yekê ji dixwazim bi riya muzikê bîkim.

Rola muzikê ji ez wiha fêm dikim: Çawa gulleyen gerilayen me ji dijimin re mirinê tinin. wiha ji pêwist e gotin û awazên me. gelê me rakin ser piyan û dijimin ber bîtarî û tunebûnê ve bibin.

Serokatiya gel di nîrxandineke xwe ya li ser muzikê de behsa hebûna "huner" mendê kontra dike. yanî ev mirov ticaretê bi muzika Kurdi dîkin. miqam û awazên me didizin. gotinê Tirkî diavêjin ser wan û ji orjinaliteya Kurdi dûr. ji bo pîrsen jiyana xwe difiroşin. Gelo ji bo mirov pêsiya vê pîrsê bigire. pêwist e ci were kirin?

- Heta berî ku di nava Kurdan de. otorîteyeke navendi peyda bibe û bi taybeti di bakurê Kurdistanê de. kesek tune bû ji wan mirovan hesab pirs bike. lê iro rewş geleki cihê ye. PKK. cawa şerê çekdarî bi gehremani dimeşine wiha ji. ji parastina çand û hebûna Kurd re ji xebateke zor dike. Di vir de pîrsa me pîrsa peydakirina alternatifeki xurt û rast e. Wan cure "huner" mend. meydan ji xwe re vala diditîn û bi gorî dilê xwe talan dikirin. Lewma li ser bingeha so-

reşgeriyê pêwistî bi derketina komên hunermendêne welatparêz heye. Tenê bi wê yekê mirov dikare gel bixe riya rast û ji dora hunermendêne sexte bi dûr bixe.

Avakirina Hunerkomê di sala 1983'yan de. di vê rê de gaveke dirokî bû. Hunerkom. bingehêke xurt ji bo pêşvebirina çand û hunera Kurdi daniye û vê rojê di welat de ji. bi dehan hunermend li ser wê bingehê muzika xwe amade dikin. Muzika vê rojê pêş dikere. muzika berxwedan û serhil dane ye. Hebûna Hunerkomê alternatifva herî xurt e li diji hunera erzan û bêbingeh.

Hûn dikarin bibêjin ku Hunerkom çiqas fonksiyon û rola xwe pêk tîne? Gelo Hunerkom çiqas bûye çavkaniya dayîna perspektivan ji bo hunermendêne welatparêz?

- Mirov neçar e rastiyekê qebûl bike ku. Hunerkom li Ewrûpa hatîye damezirandin û heta vê rojê ji. çiqas gîredan bi welat re xurt be ji. pirraniya xebatên xwe li Ewrûpa dike. İro. bê guman berhemên muzikî yê Hunerkomê digihîjin

ma me. em wiha mezîn kirine. Di nava zeviyan de. di nava kar û xebatên gund de. her tim bi hebûna folklorê ve em mezîn dibûn. Bav û apên min tev stranbêjên gelêrî bûn. Dîsa giraniya posîdâyên **Radyoya Rewanê** li ser min gelêk e. Hebûna Radyoyê gelê herêmê li ser lingan dihişt û moralê wan xurt dikir. Di dawet û şahiyan de. herdem ez li kèleka dengbêjan disekinim. Ez bi folklora Kurdi mezîn bûme.

Gelo hûn di ci dem û ci hoyan de. dest bi afirandina helbest û awazekê dikin?

- Ci dema ez çav bi xwezaya (tebieta) Kurdistanê dikevim. dilê min vedibe. Xweşîya çiya. banî. kanî. newal. zinar û gelîyen welat dikarin her mirov bikin helbestan. Jixwe ew xweşî bi xwe mîna senfonîyekê hevgirtî û bi dozan e. Lê pêwist e mirov bi duristi nêzîkî vê hebûnê bibe. Disa ditina zarakî li ser min hukmîn mezîn dihêle û dikare bibe bingeha afirandineke kûr û lihevîfî.

Ji bo nimûne helbesta "**Ez gul im, gul im**" min li ser **Ala**

Bi Ala Rengîn pêçane.

Hûn dikarin bibêjin ku Ozan Şemdin hin bêhtir ji kîjan helbesta xwe hez dike?

- Min heta niha gelek xebatên muzikê. gotin û awaz çekirine. Lê bi rastî helbesta li ser şehîd **Bêri vanê** li ba min nirxekî mezîn digire.

Ez şehîd Bêrivan. pîr ji nêzîk ve nas dikim. Ew sembla fedekarî û hevaltiya rast bû. Heta kîliya da-wî li diji dijimin şer kir û qebûl nekir ku. bi saxî bikeve destê dijimin. Lewma ew pîroziya jîna Kurd e. Navê Bêrivanê bi berxwedana **Cizîra Botan** û serhildanê ve bûye yek. Bêrivan parçeyeke hebûna gelê me ya herî bilind e.

Gotineke **Mamoste Beşikçi** çî heye. dibêje: "Eger mirov miqam û awazîn Kurdi ji Radyo û TV ya Tirkîyê derxe. pêwist e mirov wan bigire. ji ber ku tiştek namîne". yanî talankirineke ecêb heye. Hûn di vi warî de çawa difikirin? Ji bo ev proses (doman) raweste hûn li ser ci projeyen neteweyî difikirin? Gelo Hunerkom bi rewşa xwe ya iro

radibin. Hûn karê wan çawa dibînin? Çiqas bi emaneta hunerî ew ji kaien we feyde digirin?

- Em nikarin bibêjin kesekê. hûn cîma stranê me dibêjin. Tiştîn em cîdikin malê hemû gelê Kurd in. Kî dikare bibêje. bila bibêje. lê gerek e kesek bi erzanî dest navêje tiştîn hazir. Ji bo gelê me şîyar bibe. cesaret bigire û rabe ser xwe. em bi rojan kar dikin. ji bo tiştîkî baş pêşkêsi gel bikin. Eger hînek rabin tiştîn hazir bîzin û ji bo berjewendiyen xwe yên seksî bikar bînin. ev ne rast e.

Daxwaza me ji hemû komên di welat de kar dikin ew e ku. stran û awazîn me ji orjinaliteya wan dûr nekin. Nimûme: **Murat Bektaş** helbesta min. "**Lê Amedê**" dibêje. ev ne problem e. lê guhertin. xerakirin û ji orjinal bi dûrxistin ne rast e. Ez dibêjim. "Amedê paytexta Kurdistanê". ew dibêje. "Amedê paytexta Gulistanê." Belkî ditirse wiha dibêje. lê dema tîrsê nin e. Divê ozan rastiyê bidin xu-yakirin.

- Di van herdu salen dawîn de. hînek qaseten Hunerkomê li gel


Pêwist e xebatên zanyarı yê muzikî pêşve herin. Muzika me, divê di meydanên navneteweyî de cihê xwe bigire. Divê opera-yâ Kurdi ji hebe. Em bi hewcayê her cure miqam û awaz in, stranên gelêrî, mérani, şo-reşgerî û evînî, li ba me divê hebin.

her quncikîn welat û bi milyonan mirov wan berheman guhdarî dike. Gelê Kurdistanê edî bas fêm dike. herkes ci ye û ci dike?

Helbet heta vê rojê ji. gelek zor û zehmetî li pêsiya Hunerkomê hene. lê tiştek nikare pêsiya girêdana bi welat ve bigire. Hunerkom li hunermendê muzikê. mîna militanekî dinêre. Hunerkom. artêseke (ordiyeke) hûnerê ava kiriye. Ji bo nimûne di amade-kirina festîwalekî de. li ser pîrsen hûnerê bêhtirê 500 mirovan dicive ser hev. Disa xebata Hunerkom rî li mirovên dizek ji digire. ew mirovên ku çanda me kirine navgîna komkirina pereyan. Siyarbûna neteweyî ya gelê Kurdistanê vê rojê. avê li ser hunermendê dizek û kontra dicikîne.

Di nava helbest û awazîn we de. giraniya folklorâ Kurdi. xwe gelekî nîşan dide. Gelo hûn vê tesîrê çawa bi jiyana xwe ve girê didin?

- Rast e. jiyana civakî ya herê-



Hunermendê Ozan Şemdin bi Ozan Seyitxan re.

Rengîn çekirîye. Pîr ji welat dûr. di çolên Libya yê de. di hewşa me de gulek hebû. Guleke sor. Ca-rekê dema çavê min pêket. hesreta welat û hesreta Ala Rengîn dilê min guvaşt. Ew gul bû sembla Ala Rengîn û li hemû çiya û gelîyen Kurdistanê geriya. Dema **serhildana Amedê (10 Tirmeh 91)** di dilê min de hîrseka mezîn rabû. Wê çaxê ez bi hemû hisen xwe ve. di wê kîliya rabûnê de. di nava gel de bûm. Çavê min bi derya mirovan diket. Pêlén girsên gel ber jor ve radibûn. Dengê qêrin û siloganên gel dijimin diricifand. Tabûta **Wedat Aydin** ku bi ala ERNK pêçabûn li ser destan dimeşî. Gelê me kîna xwe li diji hebûna dewleta dagirker û kont-rerîlayen wê nîşan dida. Weke her mirovî min ji dengê xwe bîlind kir. Ew deng û qêrinâ min bû helbesta serhildanê:

Li Amedê serhildan e Dilana me Kurdan e Tabûta Wedat Aydin

dikare bersiva van pîrsan bide?

- Gotina mamoste Beşikçi rast e. Ne kêm. ne zêde wiha bi xwe ye. Lê. Hunerkom bi rewşa xwe ya iro ve. di warê teknîkî de. nikare bersiva demê bide. Hîna gelekî xebat. gelek kadroyen hûnerê û gelek saziyên neteweyî lazim in.

Berî her tîstî pêwist e. Hunerkom xebatên hûnerê bi profesyoneli bike. Hemû kîmanîyen teknîkî gerek e werin rakirin. Mirov neçar e projeyen nû bi pêş bixe. Hunerkom ne tenê saziyekê dengbêjan e. lewma divê şaxen cihê-cihê di warê sinema. şano. wênekeşî û hwd. de werin sazkirin. Planen dûr û dirêj. ji bo hînkirina zarakan di warê hûnerê de pêwist in. Di warê zimanê Kurdi de ji. gelek tîst dikevin ser milê Hunerkomê. Hunerkom pêwist e bibe dibistana hûnerê ya bîlind û fireh.

Di van salen dawî de. li welat gelek komên muzikê derketine. Weke we ji got pirraniya wan li ser bingeha xebatên Hunerkomê

orkestrayê derketin. Hûn weke mirovî ozan. vê yekê di warê muzika Kurdi de. şoreşek dewle-mendkirina muzikê dibînin. yan ji ev tesîra muzika Ewrûpi ye li ser muzika Kurdi? Gelo wê ev xebat bidomin an na?

- Em nikarin bibêjin em Kurd in û nabe em muzika modern çekin. Her mîletek xwedîyê orkestra ye. Em bibêjin ev ji me re na-be. ne rast e.

Di nava Kurdan de. kesekî ni-zanibe stranen bibêje tune ye. Herkes dizane govendê ji bigire. Di warê çekirina orkestrayê de. bi baweriya min. me gelekî dereng dest pê kir. Pêwist e xebatên zanyarı yê muzikî pêşve herin. Muzika me. divê di meydanen navneteweyî de cihê xwe bigire. Divê opera-yâ Kurdi ji hebe. Em bi hewcayê her cure miqam û awaz in. stranen gelêrî. mérani. şoresgerî û evînî. li ba me divê hebin.

Heppevîn: R. Cizre

Mille Abdurrahman Durrē amē Paris. Paris. bi rijio. Paris bi vēso. Ma juvin de jede qesei ni kerd. Ma juvin jede ni di. Nizon. cınarē dina. honde. girsā hira a. çutir beno na dina nūya bena tengē dina çixas honde "siritmala kivarē" ti vana. "çeune ma ber kerdō siē Kertē Mazgerdi warē. zalimu axir makineyi saz kerde. tern ū cēnē ma estē te virarē!.."

Mille Abdurrahman Durrē Paris de. mi ra fame name Zaroastar pers kerd. Waxt çine vi khe ma piya qesei bi kerime. Avē. tene name Zaroastar sero movet bi kerime. Nika dūr a dūrī çixas movet beno khe! Seveta wendiskarune Rojname Welati. ma qesūne hu pers kerime. Zaroastar kam o? Laze kami o? Kamij welatte amo riē dina? Namē Bakil ū Dakil a Zaroastar cik o? Zaroastar çutir bi Zerdüst? Zaroastar eve kamij zon Zend ū Avesta vraste? Zend ū Avesta ra qēeri zovina Kitave Zaroastar este çin e? Eve zovina qese. dokrina Zaroastar cik a? Axura Mazda cik e? Laē Zaroastar ū Axura Mazda cik e? Zone ma da ma vame "Hez ka heur xura, ma ci ra az da." No bio. a xu ra ma az da-Axura Mazda. Eve vatena raste. ma asmen ra ame ime riē dina. eve zovina vatis. heur xura. bulsk est. ma roja esmen ra ame ime riē dina. Estena ma adir a. khil rosta tija. Demokritos. tolive na doktrin o. Reze ne dina adir o.

Ev qesa raste. Zaroastar sero. zof kar amo vrastene. Ez wuanzon na karu sero tene movet bi kerime. Mē tene dūr şime. Gama virene bierjime. Şime dina khane.

Grekē Asia. Hezreti İsa ra 500 sere avē. Herodotos ra avē sera 516'de Ksanthos e Lydia. waxto khe merdena Darius sero qesei keno. qese hu ano. Tertēlē Smerdis (1) ser. Vatena Ksanthos khe rasta. name Zaroastar. zone Zend ra amo. Zone Zend de name yi ZARATHUSTRA o. Zone made fame namē yi. Za/ra/th/ust/ra. eve. zovina qese ma vame. zeria roe tu/ ustra. Zone ma de verba raustene esta juki. ro estene esta. Eve verba virene. ma vame "urze. ra urze. raustena miliete ma bē perodais nē beno.." Eve verba diyine. ma vame. "Dē urze/ urzē/ cüaveke Ma ū pi Khalkūne hu bide!". Waxto khe veng danera Haqi. u waxt "Ala urzē! urzē!"

Clement vano. fame name Zaroastar Zo/sa/ro/ (e) asteros o. Avē zovina qese. Zo/ ro/(e) astarei o= Zaroaster. Ma zone me khe. astarei pesewe taride rost dane. Siperde rosta tije ma astaru nē vineme. Roe astaru. rosta tija a (roja).

Cosmas vano. fame namē Zaroastar Zone Grekide **Zaroxθo uotnō o** Diogenes Laertios vano. Vatena Ksanthos e Lydia khe rasta. Zaroastar Hezreti İsa re avē sera 1082'da amo riē dina (2)

Filozof Platon dialogue hu Alki-biades 1 (sura 122 a) de vano khe Zaroastar discipline filozofia zanis-ta sero gureo. Zend ū Avseta re qēeri yi Fizik sero. ekonomi politik sero. hire kitabı bin vrastē. Ev qe-sa raştē Platon doktrine Zaroas-



Zaroastar, Zarathustra çutir bio Zerdüst

Mesela girse. Zaroastar sero. vatena mi cik a? Avē Zarosastar eve sene Zend ū Avesta vraştiv? Zone Zend esto, çin o? Ekhe esto, fame zone ma cik o? Zone ma de fame? Zaroastar cik o? Axura Mazda cik o? Ma vame. Zaroastar Persiz ni o. İraniz nio.

Dr. AIÜ KILIÇ

tar rind zonen o. nasken o. Filozofia Platoni de caē Zaroastar pil o. girs o. gran o. Çina re? Seveta çina i honde ca Platon dano Zaroastar?

Suidas vano. Zaroastar. zona-xe (filozofe) Medu no **Σοφος Περο Μηδος** Zaroastar **ΠΕΡΙ ΦΥΣ ΕΩΣ** (Peri fuseos) (Kainati sero) Karzanista ardo ra zu (3). Vajime khe sera 1082'da Zaroastar amo dina. yi prensibe dina sero zona-yis peida kerde. hard ū asmen sero. astaru sero rosta tija asmen sero kerzanista vrasto. fame na hipotez cik o?

Proclus. na cor kitave Zaroastar wende. Proclus i ra tipia. Clement ē Alexandria filozofia dina sero gureo. Ma zone me khe Porphyrus suxtale plotiosi o. vrastkare doktrine newe-platonizm o. Waxt khe Porphyrus.

Polithea (politika) Platoni wenda. Eizagoji vrasto. Yi sanika ER i de cao girs dove Zaroastar. hurendia Er i Zaroastar gureta. (4).

Zeller. filosofia Herakleitos sero (5) tene gureo. Vatena Zeller her waxt rast ni a. Eva vatena Herakleitos. waxt khe mordem merd. roē yi çewres roj. çewres sewe bine ondoli de berven o. Ro yeno were pirde momini uska berven o. Pirde Momin bin ra ua çem son a. Çem hen çem o. henri ku çem ni o. Tua qaim ni o. her ci vurin o. Vurnais. ju ua çem ye-no sono. Ro khe çem ser si bover endi çem. çem ni o endi u zovina çem o. Kes bese ni keno şero bover çemi. naver çemi bover o. bover çemi naver o. Waxt ū mēkan ji ua çem yen o. son o. her ci ju ua çemi Waxt ū mēkan vurin o. lewin o. Ua çem. yen a son a.

vurin o. Pirde Momin ni vurin o. Ev qesa raste. Herakleitos bine tesirē filozofia Zaroastar de mendō. Pilnus. vano khe Demokritos. Pythagoras şie Media şie Ethiopia. şie Egypte. uska tolive Zaroastar i gost dē.

Aristoteles. Metefizika ho de vano khe filozofia Herakleitos i bine tēsirē Zaroastar de menda. Aristoteles vano. "Gereke Herakleitos e Efesos i Zaroastrism rind nas bi khero." (6). Eve qesa rastē. Heraklide Kyme ū Dilon **ΠΕΡΣΙΚΑ** (Persika) de filozof sero. vatena hu ane ra dust.

Herakleitos ra avē zovina filozof biē. Aristoteles vaxto khe **Περιφιλοσοφιας** (Peri Filosofias) vrast. yi ve hu Persika Dinon' ū Hēraklide Kyme. wendivi. Heraklide Kyme vano "Zaroastar hetē Deryaē Girsi ra amo."

Derya o Girsi ra koti o? Zaroastar amo kot i? Plutarkhos vano khe. "nē mordemi cao hene.ra ame khe çor hete welate yine Derya o. Girs o." (7) Na welat koi o? Name na welat cik o? Plutarkhos vano taē Magi "Oromazes (Axura Mazda) erde tē lewe." Avesta de vano khe. "Ma Tishtrya re. seveta na astarē sere spedi re (Axura Mazda) qirwanu keme. Tē dē astarei binē mayata (Axura Mazda) de re. (8) Tishtrya. Haq o. jar a. Na jarē ua dosteni dan a. (Yasth.111.4). Zarok ē Tishtyra.

Aristoksenes. tolive Pythagorasi o. Vano. waxto khe Pythagoras şio fetelio yi ve hu tolive Zaroastar gost de. Vatena Plinus. na qesu tene kena araze.

Mesela girse. Zaroastar sero. vatena mi cik a? Avē Zarosastar eve sene Zend ū Avesta vraştiv? Zone Zend esto, çin o? Ekhe esto. fame zone ma cik o? Zone ma de fame? Zaroastar cik o? Axura Mazda cik o? Ma vame. Zaroastar Persiz ni o. İraniz nio.

Eve vatena mi. zone ma de hir ū çor fame name yi este.

1. Zar o. a) Zar zono. Ma vame zan ra "Zu ra"; "Zon ra"; "Zan ro". "Zar o".

2. Zar beno Zer. a beno e. Ma ma vame zeria min a bele yaki Zaria mina bele. Zeria. qelv o. Her ci erjino qelv mordemi. Mordem ev zeria hu ya bele Haq naskeno. ya ki nas ni keno. Na fame Zar qelv o. Qelve A Starı o. Qelve Astarı o. astarei. o (a star e). Eve qesa kilme fame Zaroastar. Qelve haqı o. Qes o rast o.

3. Astar. astare sere spedi o. A star Haq u Haq o. Roşa qelye yi Haqı a. Ma vame "Haq tua ve stara tu ni kero. A starre rie esmen de tēde wuosteni a mordemi o.

4. Zar. kaē taliē mordem o. Zar estene. qedere isoni o. Zar bi ane. derde qedere ho ra. bē hal menden a. ma vame. ma bime zar ū warı.

5. Zar Zer o. Zerd o. Na zerdineni. rengē khila rosta astari a. Eve na vatene. Zaroastar. rengē khila esqe Haqı o. Zarathustra o. Zone made fame namē yi. Za/ra/th/ust/ra. ave zovina qese ma vame. zeria roē tu/ ustra. Nu astare sere spedi o. Fame name Zaroastar zo/sa/ro/(e) astero o. Zaroastar. İraniz ni o. Persiz nio. Zend ū Avesta. eve zonē ma wa. Persi ra avē wa. Qes o Pil o khe ma pers keme. ZEND AVESTA khe Zaroastar vrasta ave kamij zon vrajia? Zonē Zend ia? Ya ki ni. Ek he zone Zendi a. Zone Zendi Zone Medun o? Ya ki nio?

Tez u Hipotez un senteze Zona-yiskaru dina ser cik e?

(1) Herodotos, Historia, 111, 61
(2) Mesina, 11 Sasuyani nella tradizione Iranica Roma P. 175
(3) Suidas, De religione veterum Persarum, 1760 p.345
(4) Mras, jitizingsb. Akad. Berlin, 1993, 253, N.2
(5) Zeller, Philos der Griechen III, Ie abt, p. 1038
(6) Aristoteles, Metaphysica, p.1091.b, 855. (F.14, Diels)
(7) Plutarkhos, De facie In orbe Luna-e, 26, p. 921, AB
(8) Plutarkhos, De Iside, 47 Fr D4 (p. fl. 127)

Diyarî ji bo rojnameya delal û xweşik: Welat

Bijî Welat

Osman Sabri

**Divê em xwe pêk bînin ji bo felata xwe
Bijîn serbilind wek çiyayên welatê xwe**

**Berên xwe nedin hevdu û şerên hev nekin
Bes riya gelparêziyê li pêş wan vekin**

**Welat ji me dixwaze xebat û têkoşîn
Ne canxulamî, nokerî û serî danîn**

**Serê ku bête danîn tu car nayê hildan
Bi qelsî kes nebûye xwedî rûmet û şan**

**Rûmet serxwebûn e, di gel ramanek xweser
Holê ji bo gel em dikarin bibin rêber**

**Rêber serî ye, nabe li pey gel bimeşe
Tu car natewe, mirin jê re gelek xweş e**

**Riya felatê pêş me dike, ew ravekar e
Li pêşberî gel û dîrokê berpirsiyar e**

**Rêberî ne karê tewtewe û qelsan e
Dijî koletî, canxulamî û pîsan e**

**Bi qelsî nikarin serên xwe hildin, rakin
Welatê xwe bistînin, gel tê de azad kin**


**Divê bi xurtî, em berên xwe bidin neyar
Bi jîr û zanatî milet bikin hişyar**

**Bijî welatê min ji bona te gorê can
Sond dixwim ku bibim pandî ji bo Kurdistan**

Şam / 11.2.1993

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Keşîşê Ordunê û çêlîkên Enqerê

Li Ordunê li gundekî xiristiyana keşîşekî (papaz) pirr sextekar, virek û durû hebûye ku xelkê gund ji derew, fesadî û qeşmeriyên wî bêzar bûne. 'îllelah' gotine. Bi tu awayî ji bela, gemarî û sextekariya wî xelas nebûne, lê şâş, mat û muhayer mane.

Rojekê rûspî û rêzanên gund li hev dicivin û vê biryarê didin ku, xelkê gund hemû bibin misilman û bi vî awayî ji keşîşê fendî, qeşmer xelas bibin, meleyek misilman were nava wan û keşîş bicehime here, pêşîra xelkê jê xelas bibe.

Xelkê gund hemû radibin, bi jin û mér ve diçine cem muftî û dibin misilman. Ji muftî re dibêjin: "Tu meleyek baş ji me re bisîne". Muftî jî dibêje: "Ser çavan û ser seran. Ezê ji we re meleyekî baş bisînim".

Demîrel, Înönü û Türkçe heta niha digotin:
"Newroz Cejna agirperestan e, qedexe ye, komünîstî ye." Dema dîtin ku gelê Kurd destê xwe jê nakişîne û Newroz bûye nîşana şoreşê, rabûn bi hemnîjadên xwe re, di şeva Newroza Kurdî de, li Antalyayê li hev civiyan û Newrozê pîroz kirin.

Xelk şâ dibin û dizivirin gundê xwe, dibêjin: "Elhemdülillah ku em bûne misilman û ji bela keşîş xelas bûn". Dema vedigerin gund, mèze dikin ku, keşîşê wan şâşika mele daye serê xwe, cubbe li xwe kiriye û derketiye ser banê dêrê, bi dengekî xweş û bilind azan dide. Gundi şâş dimînin, bawer nakin, dibêjin belkî ne ew keşîş e. Nêzîk dibin, bala xwe rind didinê û dibînin ku, bi rastî jî keşîşê wan e. Pirr şâş dimînin. Keşîş ji wan re dibêje: "Ez ji zû ve çûbûm cem muftî efendî û bûbûm misilman, min ji tirsa we newêribû bigota. Piştî ku hûn jî elhemdülillah bûne misilman, muftî efendî destûra min da, xeber da min, ez ji bûme meleyê we, dêr jî bû mizgeft. Misilmaniya me tevan pîroz be. Jixwe haya muftî efendî jê heye, ji zû ve qadroya min şandiye, min ji we vedişart". Dema ku keşîşê sextekar wilo dibêje; gundi mat û şâş dimînin. Bawer dikin ku bê lêdan û kuştin ji keşîş û bela keşîş xelas nabin. Bi jin û zarokan ve radikin çekan, êrîşî keşîşê sextekar dikin, ser û guhan lê dişkînin û hûr dikin, berdidinê ji gund diqewitînin.

Demîrel, Înönü û Türkçe jî, heta niha digotin "Newroz cejna agirperestan e, qedexe ye, komünîstî ye". Dema ku dîtin gelê Kurd bi xwîna xwe cejna xwe ye neteweyî pîroz dike, dest jê nakişînin û Newroz bûye nîşana şoreşâ Kawayê Hemdemî, pêt û şûleya agirê wê daye hemû cîhanê û natemire, tu kes êdî nikare pêşîya wê bigire. Demîrel, Türkçe, Înönü û Özal çakûçê Kawayê Kurd dane destê xwe û bi hemnîjadên (soydaşen) xwe re, di şeva Newroza Kurdî de, li Antalya civiyan û serê gur bi ser xwe ve darda kirin û bû zûqîna çêjikên Ergenekon û wiha gotin: "Newroz cejna Ergenekon e û cejna me ye. Gur jî nîşan û sembola me ye, Tirkek bi berdêlî dînyayê ye, herbîjî Newroza me û zûqînên guran".

Divê ku em jî bibêjin: "Her bijîn melayên me yên nû û keşîşen kevin, herbîjî cejna Ergenekon û guran".

Geli zarokên bi nirx, hûn berxwedar bin. Hûn zarokên iro û bav û bavpîrên pêşerjê ne. Ev çiroka ku ezê ji we re bibêjim, rastî tê de nîn e. Tev virr û derew in. Ez nizanîm ev henurmendî çawa derbas bûye nav çand û wêjeya Kurdi. Me Kurdan çawa ew ji xwe re kirine çîrok, va ye nimûneyek di destê me de heye. Çiroka me wiha ye.

Hebûn sê bira keleş, kul (veba) kete wan bûne şes. Beroşeke wan hebû, binî qul bû, goşt tê re diket û av di binê beroşe de dima. Bira tev çûbûn çolê seyd û nêçirê, yek ji wan li malê mabû. Ewqas goşt xwaribû, westibû û pal dabû ketibû xewa şîrîn. Ser simbêlê wî gelek dohn girtibû, taşî ji derve hat û ser simbêlê wî alast. Ê keleş ji xewa şîrîn ve ciniqî û got "Tî dî!" Taşî jê behetî, bi xwe de rî, cawê sor û spî. Êvarê bira tev ji çolê hatine malê û doza cawe sor û spî kirin. Ka wê kijan ji wan ji xwe re bike kirâs. Li hevdu nekirin. Rabûn gotin: "Emê biçin bal yekî zana aştiye, ka ev caw wê para kija ji me bikeve."

Rabûn dan ser rê çün û çün û çün, laqî (rastî) kalekî bûn. Kalo ji wan pîrsî; gote: "Lawê min bûyerek li we qewimiye ka derdê we ci ye ji kalikê xwe re bibêjin." Rabûn derdê xwe ji kalikê zana re şîrove kirin. Kalo gote wan: "Ev gelekî hêsanî ye. Kî ji we virreke (derewêke) mezin bike wê cawê sor û spî yê wî kesî be." Li ser hunermendiya virra bîryara xwe dan.

Birayê yekemîn dest pê kir û got:

- Berî niha bi çend salan hewarek li gundê me çêbû, em gundi tev bi hewarê ve çün, li hêla bezê min du dendikêndî kundiran li ser riya xwe xistin bin axê. (bin erdê). Çaxa ku em ji hewarê zivirîn, em ci bibînin,

Virr û derewêne mezin

I. OMERÎ



lemeke kundiran şin hatiye û her şaxekî wê lemê yek km. fireh bûye. Kundirek bi qendî (qasi) kaşekî di nav wê lemê de mezin bûye, bistikê kundir gelek qalind bû, em heft gund lê civîne bi birrek û biviran (tevir) hefta me bistikê wî birriye. Me heft gundan li hev par kir û salekê têrî me her heft gundan kir.

Birayê duyemîn gote ya min ev e:

- Berî niha bi demekê, Xwedê saleke gelek bi xêr û bereket ji me re bexş kiribû. Ew sal çandinî pirr baş bû, yekê 40-50 diavêt. Min ji xwe re genim çandibû, bêndereke min a bêqedar hebû û min bênder hilanî, ji wê bênderê çar liban (tane) genim ji me re hatibû. Min genimê xwe xiste têrekê ku ez bibime aş û bibe arvan, ji bo zivistanê nanê kuflet (kulft) hebe û zarok birçi nemînin.

Serê sibehê bi bangdana mele re, min kerê boz ji afir derxist û kurtanê wî lê kir û bar avête ser pişta kerê şamî. Kerê me bar hilneda û di bin bar de çok da. Min rabû gayê qulöçmezin anî, wî ji bar hilneda. Min de-

veya cîranê xwest û anî, ew jî di bin vî barê giran de ranebû ser piyan. Ez mame reben û bêçare. Dikê me weke her sibeh bang da û serê min zehf jê eşîya. Min bi qırıka wî girt û gote: "Tu bimî tu bimînî ezê vî barî li ser pişta te bikim û tuyê bibî hefta aş." Min têra genim avêt ser pişta dikê xwe, min dît dikê min tege tege di bin barê xwe de meşîya. Ez gelekî kîfxweş bûm, me riya aş girt û em meşîyan, em gihiştin kîleka (qıraxa) ceme-kî. Dikê min nekaribû tevî barê xwe wî çemî derbas bike. Min barê wî ji ser pişta wî danî û her çar libê genim yek bi yek bi kuçkanikê xwe avête wî rexî avê. Belê ez ci bikim çûkeki li hewa êrîş kire liben genim û yek ji wan xwar û winda bû. Ez û dikê xwe derbas bûne wî allyê avê, min genimê xwe danî ser hev, yek jê kêm bû, hemberî hev nedibû. Min hîm û latêñ mezin ji dane ber, disa berberî hevdu nebû û min tu çareseri tê de nedît. Careke min dît çûkeku genimê min xwariye, wan di ser serê min re dirêse. Min got: "Hey bêxwedî ma, ma te ci kir ji

min, te serî li min gerandî" û min rahişte kevirekî xiste kuçanîke xwe avête çûk, li berkerka wî ket û genimê min jê hate xwarê. Min genimê xwe dît û xiste têra duçemî, avête ser pişta dikê xwe, bêteşqeple em gihiştin aşê. Min barê dikê danî û ez ci bibînim, birîneke fireh di pişta dikê min de vebûye. Ez geriyame li balbijîk û zanistan (zaneyan) ka dermanê birîna pişta dikê min ci ye û wê çawa peyde bibe. Mirovekî gote min: "Dermanê birîna dikê te gûza Hindê ye." Ez geriyame li navce û bajaran, pîrsa gûza Hindê kîfî, lê min tu guman û agah jê hilnêanî. Li vegeร mirovekî gote min: "Berî niha bi heft sala min qetek gûza Hindê xwaribû, were bi pîjikan, bi ber diranê min keve, ka tu karê çiqas ber-maya gûza Hindê ji navbera diranê min derxînî." Ez bi pîjikan li navbeyna diranê wî xebitîme û min sênikek bermaya gûza Hindê derxist û anî danî ser birîna pişta dikê xwe. Qeraşa arvanê min kire ard û me xiste têra rengîn, ez rabûm derketim derve ku dikê xwe amade bikim ji bo bar û

rêwîtiyê, ez ci bibînim. Li ser pişta dikê min dareke gûzê şin hatiye, çire çire çûkan li ser darê ne. Min kîstekîk axê avête çûkan serê darê, bûye hêre hêre cotkaran li ser darê. Ez rabûme bi darê ve hilkişime, çûme ser darê. Ew axa ku min avêtibû çûkan bûye beriyeke weke ya Qoserê (Kızıltepe), cotkaran cotê xwe û paleyan palehiya xwe dikirin. Ez geleki tî bûbûm, vege riye nava bostanekî (werzekî) min şebeşek (zebeşek) ji lemekî jê kir, min şîlfika xwe (kêra bêkalan) li şebeş xist, belê şîlfika min di nava şebeş de winda bû. Min destê xwe li pey şîlfikê daxiste nava şebeş, lê peyde nebû. Min xwe bi serî ve berda nava şebeş, sed maşelâh ji navê Xweda re ez ketime nava bajarekî weke Amedê. Ba-jar mezin e, bêserî û bêbinî ye. Min got heye tune ye şîlfika min li sûka hesinkaran e. Li serê kolanê min ji hesinkarê yekemîn pîrsî. "Ma ha-yâ te ji şîlfika min nîn e?" Gote min "Birazî berî niha şîlfikek ji min re anîn, min heft gîsinê Helebî jê qedandî û min daye cîranê xwe." Ji destpêka kolanê heta dawiya kolanê her hesinkarekî heft gîsin jî, ji şîlfika min qedandibûn, hesinkarê dawî şîlfika min daye min. Min lê meyzandî, ji qulpika wê pê ve neçübû.

Kalo gote keleşê sêyemîn: "Ka tu karî ci bibêjî." Keleşê sêyemîn gote: "Mamê hêja û zanist, ez ci reben im ku, ez karibim virreke weke vê virrê bikim. Em bira tev ji mafê xwe ketin. Caw, cawê duyemîn e."

Erê zarokên bi nirx û hêja, berî niha ev çirok, virreke herî mezin bû. Ema iro virrê ku desthelatdar û rîvebirê dewletê dikin, ji virra nava vê çirokê hîn mezintir in.

Hûn berxwedar bin û bi dê û bav mezin bibin.



Çend gotinêne listikan

(JI BO HILBIJARTINA BÜKA LİSTIKÊ)

Kalo Kindo/ Çala çema/ Mîşka Ema/ Tasa nesri/ Ga û nexvî/ Hap-pete/ Zappete/ Kurfile min/ Eyarî te.

Yek dudo/ Bawer sisê/ Çeq-fisê/ Memo dîno/ Li kevrêşino/ Qesra Eli/ Çardeh derî/ Yek jê Te-ter/ Yek jê Meter/ Nêhîrî kever.

Sekkê sekke/ Seranekê/ Gula çepo/ Çepil mizo/ Xana guzo/ Dosta ïnê/ Ser mizgînê/ Libek tirî/ Dixindirî/ Şam û şeyî/ Qûl qûleyî/ Nigileyî/ Li pişta te yî.

Sat Axa/ Setil Axa/ Hillîfi/ Milifi/ Çeqçûlifi/ Her tutik/ Bawer tutik/

Şêx Galanê devrûtik.

Sekkê Sekkê/ Seranekê/ Dabis-kanê/ Gula Çepo/ Çepo Mijo/ Da-ra gujo/ Libek tirî/ Dixindirî/ Du-marê reş/Du gulê geş/ Mîr Xatûnê ez û tu xweş.

Ro derket/ Mizgîn derket/ Xidir bazî/ çortan dizî/ Çû ser darê/ Pif kir karê/ Kar melisi/ Gur fetisi.

Yek û yek/ Tayrikê belek/ Zaza bilbil/ Dermanê dil/ Şekir û şima/ Li ber çeman/ Çemê Zazê/ Av tê nema/ Ez kuncî/ Tu kuncî/ Ser tex-tikê narincî.

Çirokê/ Çivanokê/ Golika Xanê/ Çû meydanê/ Sa berdanê/

Negihanê/ Kevçiya werîn/ Ji kev-çîdangê/ Savêr were/ Ji hebanê/ Da xortê malê/ Bixwe noxşicanê/ Dîwêr got xir/ Pîrê got pîr/Sofi got riha min/ Bi ser de kur.

Herhopê/ Qertopê/ Pezikê Mîra li ku diçêre?/ Li Zozanan/ ci dix-wi?/ Gul û giyanan/ Ci dirî?/ Safi herî/ Daweta kijan qîzê?/ Ya hin de qîzê.

Çirokê/ Çivanokê/ Rûnê rokê/ Berda cokê/ Cok mirçiqa/ Rûn be-riqi/ Golika Xalê/ Çû piş malê/ Ne guran xwar/ Ne dizan bir/ Go be-e û beheci.

Berhevkar: Jîr Dilovan



Esma Uveyş Öcalan wefat kir

Diya Serokê PKK'ê
Abdullah Öcalan
Esma Uveyş Öcalan,
roja 11'ê Nisanê li gundê Mîsîs
a Edenê rehmet kir. Cendeka
Esma Uveyş Öcalan
li ser wesiyyeta wê, li gundê Omerli ya Xelfetiyyê,
bi beşdariya 2500 kesî ve hate binaxkirin.
Gelên ku xwestin beşdarî
cenazeya Esma Uveyş Öcalan bibin,
li ser riya Xelfeti û Omerliyê hatin sekinandin
û hêzên dewletê nasnameyên wan civandin.
Hin ji xelkê nexwestin nasnameyên xwe bidin
û ev rewş protesto kirin. Tevî van rîlibergirtinan,
2500 kes beşdarî cenazê bûn
û darbestâ Esma Uveyş Öcalan
bi ala kesk û sor û zer ve xemilandi
hate binaxkirin.
Li ser mirina Esma Uveyş Öcalan,
gelek sazî, komele û rîexistinê Kurd
mesaj belav kirin.
Hin ji rîexistin, sazî û komeleyên ku
mesaj belav kirine ev in:

KURD-HA,
HUNERKOM,
FEYKA, HEV-KOM,
AGRI-VERLAG,
BERXWEDAN, SERXWEBÛN,
Komîteyên Kurdistanî
û Sentrûmên Çandî yên Almanya,
Avusturya, Avustralya, Belçîqa, DYA, Danîmarka,
Finlandiya, Fransa, Qibrîs, Qanada,
Lîbya, Swêd, Hollanda, İspanya, Swîsre,
İngîlîstan û Yewnanîstan,
Yekîtiya Esnafê Fransa,
Botan Spor, Cûdi Spor, Dêrsim Spor, Amed Spor,
Serhildan Spor, Herekol Spor, Gabar Spor,
YJWK, YCK, YKWK, FED-KOM, PKK-KN,
ARGK-Qerargeha Bingehîn,
ERNK-Nûneriya Rojhilata Navîn,
ERNK-Nûneriya Tirkîye,
li ser navê Kurdên ku li Ewrûpa dijîn
-Mustafa Karasu, Kanî Yilmaz.
Li aliyê din
Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan jî,
li ser mirina dayîka Esma Uveyş mesajek belav kir.